

**Wusleto Heqîqî û Fîraqo Mecazî yan Fîraqo Heqîqî û Wusleto
Mecazî; Edebîyatê Klasîk yê Zazakî de Terenumê Wuslet û Fîraqî**

Ahmet Kırkan¹

**Hakiki Vuslat, Mecazi Firak veya Hakiki Firak, Mecazi Vuslat; Klasik
Zazaca Edebiyatta Vuslat ve Firak Terennümleri**

Öz

Vuslat ve firak, edebiyatın önemli iki kavramı olmasının yanı sıra, hayatın da önemli iki gerçeğidir. Bu iki kavram beraber düşünüldüğü zaman anlam ifade ederler. Vuslat ve firak birbirine geçmiş iki kavramdır, meydana gelen bir olayın vuslat veya firak olarak kabul edilmesi görecelidir. Vuslat bir firaka, firak başka bir vuslata dönüşebilir. Çalışmada vuslat ve firak kavramları bu çerçevede ele alınmış, vuslat ve firakın göreceli durumu izah edilmeye çalışılmıştır. Çalışmanın amacı Zazaca klasik edebiyatındaki metinlerden vuslat ve firak kavramlarını ele almaktır. Dünya asıl vatanından ayrılan bir ruh için hakiki firak, onu bekleyen yakınları için ise mecazi bir vuslattır. Yine hicret, göç ayrılan ve varılan yere göre vuslat veya firak olarak yorumlanabilir. Bu çalışma iki kısımdan meydana gelmiştir. Çalışmanın ilk kısmında vuslat ve firak kavramları mecaz ve hakikat bağlamında ele alınmış; hakiki vuslatın mecazi bir firak olduğu, hakiki bir firakın mecazi bir firak olduğu üzerinde durulmuştur. Zazaca klasik edebiyattan örneklerin verildiği ikinci kısımda doğum, ölüm, göç ve dünya kavramları temele alınarak vuslat ve firak açıklanmıştır. Her alt başlıkta çeşitli yazarlardan örnekler verilmiş ve bunlar izah edilmiştir. Çalışma, Zazaca klasik edebiyatı bu iki kavram etrafında incelediği için önemlidir. Zazaca klasik edebiyat üzerine çeşitli derleme çalışmaları olsa da, bu tür özel okumaların az olduğu açıktır. Bu açıdan çalışma Zazaca klasik edebiyatı derin bir analize tabi tuttuğu için önemlidir. Çalışmada yayımlanmış ve temin edilen klasik edebiyat eserlerine yer verilmiş, Kurmanca, Türkçe, Arapça ve Farsça eserlerden de yararlanılmış ve bu dildeki klasik eserlerde vuslat ve firak kavramlarının nasıl ele alındığı izah edilmiştir. Çalışmada açıklama, örnek verme, karşılaştırma, tanık gösterme, tanımlama gibi yöntem ve teknikler kullanılmıştır.

262

¹ Doç. Dr., Mardin Artuklu Üniversitesi, Edebiyat Fakültesi, Kürt Dili ve Edebiyatı Bölümü, ahmetkirkkan@gmail.com, ORCID ID: [0000-0003-3885-5218](https://orcid.org/0000-0003-3885-5218).

Makale Gönderilme Tarihi / Article Submission Date: 01.12.2024

Makale Kabul Tarihi / Article Acceptance Date: 03.02.2025

Yazarlar dergide yayınlanan çalışmalarının telif hakkına sahiptirler ve çalışmalarını CC BY-NC 4.0 lisansı altında açık erişim olarak yayımlanmaktadır.

Authors own the copyright of their work published in the journal and their work is published as open access under the CC BY-NC 4.0 license.

Anahtar Kelimeler: Klasik edebiyat, karşılaştırmalı edebiyat, Zazaca, vuslat, firak.

Genuine Vuslat, Figurative Firak or Genuine Firak, Figurative Vuslat; Vuslat and Firak in Classical Zazaki Literature

Abstract

Vuslat and faraway are not only two important concepts of literature, but also two important facts of life. These two concepts make sense when they are considered together. Vuslat and firak are two intertwined concepts, the acceptance of an event as vuslat or firak is relative. Vuslat can turn into a firak, and firak can turn into another vuslat. In this study, the concepts of vuslat and firak are discussed within this framework and the relative status of vuslat and firak is tried to be explained. The aim of the study is to deal with the concepts of vuslat and firak from the texts in Zazaki classical literature. The world is a literal departure for a soul leaving its original homeland and a metaphorical vuslat for its relatives waiting for it. Again, hijra, migration, migration can be interpreted as vuslat or departure according to the place of departure and arrival. This study consists of two parts. In the first part of the study, the concepts of vuslat and firak are discussed in the context of figurative and real; it is emphasised that a real vuslat is a figurative firak and a real firak is a figurative firak. In the second part, where examples from Zazaki classical literature are given, the concepts of vuslat and firak are explained on the basis of the concepts of birth, death, migration and the world. In each sub-heading, examples from various authors are given and explained. The study is important because it analyses Zazaki classical literature around these two concepts. Although there are various compilations on Zazaki classical literature, it is clear that such specialised readings are scarce. In this respect, the study is important because it subjects Zazaki classical literature to a deep analysis. In the study, published and obtained classical literature works are included, Kurmanji, Turkish, Arabic and Persian works are also used and how the concepts of vuslat and firak are handled in classical works in this language are explained. In the study, methods and techniques such as explanation, giving examples, comparison, citing witnesses and definition have been used.

Keywords: Classical literature, comparative literature, Zazaki, vuslat, firak.

Kilmîye

Wuslet û fîraq tenya mîyanê edebîyatî de di hebî mefhûmî bingeyînan nê, heman dem de di rastîyê heyatî îfade kenê. Nê her di mefhûmî ancax pê reyde bêrê fikirîyayene mana danê. Çünke wuslet û fîraq hetê mana ra kewtê têmîyan; waqîyê ke yenê meydan wuslet yan fîraq ê goreyê rewşe û kesî vurîyêno. Wuslet eşkeno bivurîyo û bîbo fîraq, heman şekil de fîraq zî eşkeno yewna form bigîro û bîbo sey wusletî ya. Na xebate de mefhûmê wuslet û fîraqî na çarçowe de ameyê nirxayene, îzafîbîyayîşê mefhûmanê wuslet û fîraqî ameyo îzahkerdene. Amancê na metnanê Edebîyatê Klasik yê Zazakî

de mefhûmanê wuslet û fîraqî îzahkerdiş o. Keso ke wetenê xo yê eslî ra koç kerdo yan newe ameyo dunya, seba ey dunya sey cayê surgunî yo û no fîraqo heqîqî; seba merdîmanê ey zî sey welidîyayîşê wusleto mecazî yo. Heman şekil de koçkerdiş û hîcret zî goreyê cayê abirîyayîşî û cayê resayîşî eşkeno sey wuslet yan fîraq bêro hesabnayene. Na xebate di qisman ra pê yena. Qismê ewilî de mefhûmê wuslet û fîraqî goreyê heqîqet û mecazî de ameyê nirxayene; rastîya wusleto heqîqî eslê xo de yew fîraq mecazî, fîraqo heqîqî zî eslê xo de wusleto mecazî yo ameya îzahkerdene. Qismê dîyîn yê na xebate de mefhûmê wuslet û fîraqî termanê sey merg, wîladet, koçkerdiş û dunya reyde ameyê etudkerdene. Her binbeş de cîya nuştovan ra nimûneyî deyayê û miyanê metnî de nê nimûneyî îzah bîyê. Na xebate Edebîyatê Klasîk yê Zazakî derûdorê nê di mefhûman de tedqîq kena qandê cû na xebate muhîm a. Derheqê Edebîyatê Klasîk yê Zazakî de heta nika çend babet xebatî ameyê kerdene labelê goreyê di mefhûmanê dîyarkerdeyan heta nika kêman rey xebatî ameyê kerdene. Qandê cû na xebate de Edebîyatê Klasîk yê Zazakî ser o analîzêko xorîn ameyo kerdene. Xebate de Zazakî de warê edebîyatê klasîkî de berhemê ke weşanîyayê û dest fîneyayê ra teber berhemanê edebîyatê klasîk yê kurmancî, tirkî, erebî û farisî ra îstîfade bîyo. Nê ziwanan de şopa mefhûmanê wuslet û fîraqî ameyo taqîbkerdene. Na xebate de metod û rêbazê sey îzahkerdiş, nimûnedayîş, muqayesekerdiş, şahidnawnayîş, pênaskerdiş ameyê şuxulnayene.

Kilitçekuyî: Edebîyato klasîk, edebîyato muqayeseyîn, zazakî, wuslet, fîraq.

Extended Abstract

Concepts that are important in many areas of life have naturally taken place in literature. In this respect, we can accept literature as a reflection of life. Vuslat and fîraq are among such concepts. Besides being two important concepts of literature, these two concepts are also two important facts of life. Reunion and separation occur in every field and time of life. A routine life without reunion or separation is hardly possible. These two concepts make sense only when they are considered together. Vuslat and parting are two intertwined concepts, and it is relative whether an event is considered as vuslat or parting. Every reunion can turn into a separation and every separation can turn into a reunion. Reunion brings separation with it, and separation brings reunion. Reunion and separation can be analysed in two parts: literal and figurative. In classical literature, real reunion can only be achieved through reunion with God. This can only be achieved through death and going to heaven. According to the belief, death is the reunion and union of man, who is separated from his homeland, with God. In classical literature, this theme is discussed a lot and the beauty of death is expressed. While true reunion is expressed by death, true separation is expressed by birth. The separation of man from his homeland, his detachment from God and his exile begins with his birth. Every person born is in a real separation. He has moved away from his original homeland, the place where he should be, and has been sent into a kind of exile. In classical literature, seeing the world as a place of exile and an aversion to life is a reflection of this real desertion. In this study, the concepts of vuslat and fîraq are discussed within this framework, and the relative status of vuslat and fîraq is tried to be explained. The aim of the study is to explain how the concepts of vuslat and

firaq are treated in the texts of Zazaki classical literature. The study consists of two parts. In the first part of the study, the concepts of vuslat and firaq are discussed in the context of figurative and real; it is emphasised that a real vuslat is a figurative firaq and a real firaq is a figurative firaq. Various combinations of firaq and vuslat have been emphasised and these possibilities have been explained with various examples. In the second part, where examples from Zazaki classical literature are given, the concepts of vuslat and firaq are explained on the basis of the concepts of birth, death, migration and the world. In each sub-heading, examples from various authors are given and explained. For example, birth or the world is a literal departure for a soul leaving its original homeland and a metaphorical vuslat for its relatives waiting for it. This state of vuslat and departure occurs at the same time and in the same event. It is very difficult or even impossible to determine whether the event is vuslat or faraway. Again, hijra, migration can be interpreted as vuslat or firaq according to the place of departure and arrival. If the place of departure is an unloved place, it is more of a vuslat rather than a faraway place. In classical literature, the concepts of hijra and migration are mostly handled together with the hijra of the prophet and associated with vuslat and desertion. The study is important because it analyses Zazaki classical literature around these two concepts. Although there are various compilation studies on Zazaki classical literature, it is clear that such special readings are rare. In this respect, the study is important because it subjects Zazaki classical literature to a deep analysis. Studies in which intensive readings are made around certain concepts provide clearer and more specific information about the subject being studied. In the study, published and obtained works of classical literature were included, Kurmanji, Turkish, Arabic and Persian works were also used and how the concepts of vuslat and firaq were handled in classical works in these languages were explained. In Zazaki, as in other classical literature in other languages, the concepts of vuslat and firaq are used in accordance with metaphors. The world is regarded as a place of separation, death as a true reunion, birth and migration as a temporary separation. These definitions are in harmony with examples of classical literature in other languages. In the study, methods and techniques such as explanation, giving examples, comparison, witnessing and definition were used. Especially explanation was used intensively and many examples were given from the available works. The examples given were explained according to the context and examples from other literatures were given where necessary. Zazaki classical literature has developed especially in recent periods. After the works written in the first half of the twentieth century, Zazaki classical literature, which had fallen into a stagnation, has revived in recent years. Especially the works written in the last period were also used in the study. In this respect, it is possible to see the changes in Zazaki in the field of classical literature within the framework of the concepts of vuslat and firaq.

Qelbê to ra ez surgun bîya verî
Heme surgunîyê min hetêk ra berdewamîya nê surgunî yê
Xêncê heme merasîman, zîyafetan, ayînan, roşanan
Ez ver ba to ameya, ameya xo bierza linganê to
Ameya efû biwaza, herçiqas layiqê efûyî nêba zî
Derg meke surgunîya min ya dunyayî.²

Destpêk

Wuslet û fîraq mîyanê edebîyatê klasîkî de sey mefhûmê muhîmî qebûl benê. Nê her di mefhûmî eslê xo de eşqî ya girêdeyayeyê û beno ke eşq sayeyê nê mefhûman yeno meydan, erj gêno. Nê mefhûmî dûrîkewtiş û pêresayîşî îfade kenê û eşq xora dûrîkewtiş, pêresayîş, dûrîkewtiş û mîyanê nê prosesê de fertilîyayîşî ya yeno meydan. Wuslet xo mîyan de fîraqêk, fîraq zî mîyanê xo de wusletêk hewêneno. O semed ra aşîq ne wusletî ra ne fîraqî ra tam emîn beno. Çünke her wuslet fîraq, her fîraq zî wusletêk o.

Bitaybetî edebîyatê klasîkî de mijara wuslet û fîraqî ameya şuxulnayene. Edebîyatê rojhelatî de mesnewîyanê eşqî de nê her di mefhûmî gelek rey ameyê bikarardene. Aşîq û maşûqe yew eşqêko bi wuslet û fîraqî ya mûnîyaye cuyenê. Ameyîşê maşûqe yew wuslet, vîndîbîyayîşê aye fîraq o. Eke maşûqê çîmanê aşîqî ver ra vîndî bibo zî aşîq halê fîraqî de xo hîs kenê. Labelê aşîq wusletî ra tu rey mutmeîn nêbeno. Cureyê bînî yê edebîyatê klasîkî de nê mefhûmî bi şekilanê cîyayan reyde ameyê îfadekerdene. Mîsale mewlîdan de fîraq bi merdîşê cenabê peyxemberî ya vajîyayo. Mersîye û sewbîna babetan de zî mefhûmê fîraqî tesbît beno. Edebîyatê klasîkî de eşqo heqîqî û eşqo mecazî esto. Heman şekil de wuslet û fîraq zî bi eşqî ya girêdaye sey heqîqî û mecazî di beşan rê teqşîm bîyo. Serdemê modernî de wuslet û fîraq tenya bi aşîq û maşûqî reyde xesr bîyo.

Amancê na xebate varyasyonanê wuslet û fîraqî ser ra Edebîyatê Klasîk yê Zazakî de bi nimûneyan reyde tedqîqkerdiş o. Varyasyonan ra qesd cîya şekilan a fîraq û wusletî nirxnayîş o. Wuslet û fîraq goreyê nirxnayîşî eşkeno bivurîyo. Qandê cû wusleto heqîqî û fîraqo mecazî, wusleto mecazî û fîraqo heqîqî; fîraqo heqîqî û wusleto mecazî, fîraqo mecazî û wusleto heqîqî çar binbeşî tesbît bîyê û metnê edebîyatê klasîkî goreyê nê binbeşan ameyê nirxnayene. Seke metnan de zî bêro vatene ge ge yew rewşe goreyê bergehê vatoxî vurîyêna.

Edebîyatê Klasîk yê Zazakî ser o nê serranê peyênan de xebatî ameyê kerdene. Labelê nê xebatî hîna arêkerdiş, transkrîbekerdiş, edisyon-krîtîk kerdişî ra îbaret ê. Goreyê mijaran û babetan dabeşkerdiş û analîzkerdişê berhemanê Edebîyatê Klasîk yê Zazakî hîna nêameyo kerdene. Beno ke badê arêkerdiş û edisyon-krîtîkî, Edebîyatê Klasîk yê Zazakî ser o zî goreyê mijar û tewiranê edebî xebatê spesîfîkî bêrê kerdene. Wuslet û fîraq mijaranê serekeyan yê edebîyatê klasîkî ra yê. Qandê cû na xebate de nê mijarê edebîyatê klasîkî tedqîq bîyê.

² Sezai Karakoç, *Sürgün Ülkeden Başkentler Başkentine*, no qisim terefê ma ra açarnîyayo.

Seba na xebate edebîyatê klasîk yê zazakî ameyo tedqîqkerdene. Edebîyatê Klasîk yê Zazakî sey edebîyatanê şaranê bînan demek û mekanêk de sînardar nîyo. Berhemê ewilî yê dest de yê Edebîyatê Klasîk yê Zazakî serra 1899î de dest pêkerdo û no prosesê nuştîşê berheman hîna zî berdewam o. Na xebate de berhemê kesanê sey Mela Ehmedê Xasî, Muftî Osman Esad Efendî, Milla Cimayo Babij, Mela Kamilê Puexî, W. K. Merdimîn, Mela Muhemmedê Kavarî, Muhemmedê Şêx Ensarî, Mela Mehmet Demirbaş, Mela Ebdulqadirê Muşekî, Mela Orhan Sekaronij, Mela Faruq Baynal û Mela Aziz Bekî ameyê etudkerdene. Nê edîban zafane medreseyanê klasîkan -medreseyan de demanê peyênan de taye revîzyonî ameyê meydan- de perwerde vînayo, mijar û babetanê edebîyatê klasîkî zaf baş zanê. Xora berhemanê înan de tesîrê usûlê klasîkî xo nişan dano. Seke nimûneyan de zî eşkera beno nê edîbî derheqê mefhûmanê wuslet û fîraqî de goreyê qaydeyanê edebîyatê klasîkî -kêm zêde- heman çi fikirîyênê. Xêncê nê berheman, berhemanê teorîyê edebîyatî, felsefe, meqaleyan, berhemê analîzê edebîyatî, teblîxan, ferhengyan ûsn ra zî îstîfade bîyo.

Na xebate de îzahkerdiş, teswîrkerdiş, analîzkerdiş, nimûnedayîş, muqayesekerdiş û sey nînan metodî ameyê şuxulnayene. Verî mefhûmê wuslet û fîraqî pênas bîyê. Cîya kulturê de manaya û çarçoweyê nê mefhûman deyayo, varyasyonê nê mefhûman îzah bîyo. Dima zî mîyanê Edebîyatê Klasîk yê Zazakî ra sey bîyayîş, merg, koçkerdiş û dunya çar binbeşan ser ra wuslet û fîraq ameyo nîrxnayene.

1. Wuslet û Fîraq

Wuslet û fîraq mîyanê cûya însanî de her tim ca gêne û însanî nê di mefhûman goreyê xo şirove kenê. Resayene yan cîyakewtene/dûrîkewtene mîyanê prosesî eşq û heskerdişî de di rewşê muhtemel ê. Eke tede merdene yan dunyaameyene ûsn çînêbo resayene û dûrîkewtene seba însanan rewşê rojane yê. Labelê edebîyat de -hem modern hem klasîk de- rewşê wuslet û fîraq di mefhûmê tesîrkarî yê. Edebîyatê modernî de formê eşq, sewda, wuslet û fîraqî formê xo bedîlnayê (Yıldız, 2024: 171). Cêr ra nê her di mefhûmî îzah bîyê.

1.1 Wuslet

Wuslet kokê وصل (wesele) ra yeno ferheng de *manayanê pê het ameyene, eleqe sazkerdene, dest fînayene, yewbîyayene, resayene, resayîşê heskerdeya* xo ûsn manayan îfade keno (Mutçalı, 2015: 1001-1002; İşler & Özay, 2012: 1134). Wuslet çekuyanê sey *wesl, wuslet, wîsal, ittîsal, wasil, sila, muttesil, wusûl, wîsal* ûsn reyde têkildar o (Mutçalı, 2015: 1001-1003; Uludağ, 2016: 374). Nê çekuyî heme yew kok ra zêdeyayê. Hemberê nê mefhûmî de mefhûmê fîrqaî çekuyanê sey *fesl, fasila, fîrquet, hîcran* ûsn reyde têkildar o (Uludağ, 2016: 382).

Demanê verênan ra ke mefhûmê wusletî hişê însanan de sey emelo tewr berz û amanco nîhaî ca girewto. Sufîyanê ewilînan *hecr, hîcran, hîcret* sey halê dijberê wîsal û wusletî name kerdo. No proses bi zuhdî reyde dest pêkeno, bende nêzdîyê Homayî beno û dima wuslet pê yeno. Wuslet manaya tewr berzî de *mîyanê*

pêvajoyê seyrûsulûkî de resayîşê Heqî îfade keno. Heq[îqet] û Homayî ra dûrîkewtiş zî sey *înfisal* yeno namekerdene. Seyrûsulûk; tewir, emel, îbadet, kar û hereketê ke însanî nêzdîyê Homayî kenê îfade keno. Sulûk manaya rayîr de yeno labelê terîq û terîqetî ra hîna hîra yo. Lîteraturê tesewufî de sulûk mefhûmanê sey *seyir*, *mîrac*, *îsra* reyde ameyo şuxulneyayo. Terîqetî şekilêko formel de îcra bene labelê sulûk de formêko formel çînî yo. No mefhûm reya verên terefê Ebdulkerîm el-Quşeyrî ra ameyo bikardene. Bade Quşeyrî gelek mutesewifan no mefhûm -kêm zêde- heman mana de şuxulnayo. Salîko ke (raywan, keso ke kewto rayîra sulûkî) vejîyayo rayîr encam de qayîlo ke xo biresno Homayî û wusletê mutleqî peyda bikero. Goreyê rewşa salîkî çend hebî mertebeye sulûkî estê labelê mertebeyê tewr berzî de yew nîhayet çînî yo, no her daîm deweran keno (Uludağ, 2010: 127-128).

Lîteraturê Îslamî de însanî seba îmtîhanêk ameyê xelqkerdiş, erzîyayê dunya. No hereket û îmtîhan însanî Heqî ra dûrî kewtê. Eke însanî halê sukûnî de bimendayêne, ê do Heqî ra û Homayî ra dûrî nêkewtayêne. Amancê nîhaî yê ameyîşê dunyayî reyna resayîşê wusletê heqîqî yo.

1.2. Fîraq

Fîraq yan fîrquet çekuyêka erebî ya kokê فرق (ferîqe) ra yena manayanê *birnayene*, *cîya kerdene*, *dûrî kewtene*, *terk kerdene*, *ferq finayene*, *ferq*, *ters*, *beş*, *tersok* ûsn îfade kena (Mutçalı, 2015: 1001-1002; İşler & Özay, 2012: 427-428; Alay, 2011: 169). Nê kokî ra çekuyê sey *ferq*, *fîraq*, *fîrquet*, *farûq*, *firqa*, *tefrîqa*, *tefrîq* ûsn zêdeyayê. Mîsale nê çekuyan ra *farûq* sey leqebê xelîfe Umerî ameyo şuxulîyayene.

Terefê ehlê tesewufî û edîban ra fîraq sey cîlweyêkê heyatî û heskerdişî vîneyayo. No mefhûm ge ge bi *hecr* yanî dûrîkewtiş û terkkerdişî ya îfade bîyo. *Hecr* hîna zêde heme mexlûqetan ra dûrîkewtiş û tenya Homayî reyde eleqedarbîyayîşî îfade keno. *Hecr* yan *hîcran* û *fîraq* xo reyde wusletê Homayî peyda keno. Xora goreyê mutesewifan *hecro eslî* û *fîraqo bîngeyin* Homayî ra dûrîkewtiş û ey ra cîyamendiş o. Wuslet beyntarê însanî û Homayî ra perdeyan wedarnayîşî îfade keno. Sînaye ra dûrîmendiş sey *fîraq* û *hecr* ameyo hesibnayene. Mutesewiffî meqamê sînaye bi meqamê wehdetî ya girêdanê û fîraqî no hewa şîrove kenê (Uludağ, 2016: 138).

Goreyê Caferê Sadiqî no dunya de wusletêko heqîqî mumkun nêbeno çunke însan no dunya de fîraqêko heqîqî de yo. Seba ke însanî wusletêko heqîqî tecrube bikerê û biresê amancê xo ganî heme kesayetî, xobîyayîşê xo ra derbas bibê (Ceyhan, 2013: 143-145). Fîraq tenya manaya neyînî de nêyeno şuxulnayene, seke cor de zî nîşan bîyo, fîraq xêncê heq û heqîqetî heme vêşîyîyan ra dûrîkewtiş û rîtadayîşî zî îfade keno û na mana de yew mefhûmo erênî yo.

1.3. Têkilîyê Wuslet û Fîraqî

Têkilîya mabeyne wuslet û fîraqî de peywendîyêka zaf hetin a. Kes nêeşkeno na têkilî bi çend hetan û nuqteyan reyde sînor bikero. Na xebate de wuslet û fîraq goreyê heqîqî yan mecazî bîyayîşî tenya di hebî varyasyonan ser ra ameyê îzahkerdene. Nê varyasyonî zî çar mana û cihetan ser ra analiz bîyê. Tîya de tenya Edebîyatê Klasîk yê Zazakî ra nimûneyî nêdeyayê; seba ke sînor û mijar hîna baş bêro diyarkerdiş sey sewbîna edebîyatan ra zî nimûneyî deyayê.

1.3.1. Wusleto Heqîqî, Fîraqo Mecazî & Fîraqo Heqîqî, Wusleto Mecazî

Mîyanê cuya însanî de taye rewşî estê ke tēmîyankewte yê, kes nêeşkeno nê rewşan bitemamî tēmîyan ra vejo. Kamcîn kamcîn o, ganî kes senîn îfade bikero, çi tewir şirove bikero zaf zehmet o. Manayê nê rewşan goreyê derûnîya kesî, goreyê şert û mercan eşkeno bivurîyo. Sîtavê nê rewşan edebîyat de zî xo nişan dano. Ge ge rewşêka xirabe sey rinde, rewşêka rinde zî sey xirabe eşkena bêro îfadekerdene. O samed ra wusleto heqîqî eşkeno terefê sewbîna kesan ra sey fîraqo mecazî bêro vînayene.

Nê mijaran ra yew merg o. Merg cîya şekilan de yeno şirovekerdene labelê edebîyatê klasîkî de merg her tim rayîrê dunya ra reyayîşî û resayîşê sîname yo. Mewt erebkî de kokê موت مات (mate-mewt) zêdeyayo û mergî îfade keno (Mutçalı, 2015: 878-879). Nê kokî ra mewt, meyît Zazakî de heman kontekst de yenê şuxulîyayene (GXV, 2021). Merg; orte ra werîştîş, merdîş, fewtkerdiş, dunya ra şîyayîş ûsn manayan îfade keno. Çekuyê ke sey mewt, fewt, meyît, memat bi çînêbîyayîşî reyde têkildarî yê. Fewt zî erebkî de kokê فوات (fewt-fate) zêdeyayo û reyna mergî, vîndîbîyayîş, derbasbîyayîş îfade keno (Mutçalı, 2015: 71; İşler & Özey, 2012: 875). Nê kokî ra fewt, fewtkerdiş zêdeyayê Zazakî de heman kontekst de yenê şuxulîyayene.

Merg goreyê her kesî zor o labelê merdîmanê nêzdîyê mewteyî cîyabîyayşêko gird, heta kes eşkeno vajo ke seba înan sey fîraqo heqîqî yo. Labelê merg bitaybetî terefê mutesewifan ra sey berê wusletê heqîqî vîneyayo. Misale Mewlana Celaleddînê Rûmî roja mergê xo sey Şeb-î Arûs name keno û na roj sey roja wusletê aşîq û maşûqî qebûl keno. Na şewe de aşîq û maşûq resayê yewbînî, dost resayo dostî. Heta nê şewan de ge gana taye sazî zî yenê cinîtene (Uludağ, 2016: 328-329). Na şîra ey ya cêr de ya nê fikirê ey temsîl kena.

Roja ke ez merda tabûtê min de derbas bibo
 Mevaje ke no cîhan derdê min o
 Seba min mebermê û mevajê: “heyf, heyf”
 Cenazeye min vînenê mevaje: “fîraq, fîraq”
 Mi rê wuslet û demê resayîşî yo
 Gama ke min defin kenê mevaje: “weda, weda”
 Ke mezel perdeye Cananî ûş arî bibo
 Awanşîyayîşê tîjî û aşmî çirê zîyan bibo
 To rê awanşîyayîş o labelê akewtiş o (Mewlana, 1372: 357).

Mewlana wuslet û fîraqî goreyê kontekstî şîrove keno. Vano ke roja ke ez merda mevaje heyf ke merdo, gelo şima çi zanê ke merdîş seba min xirab o. Roja ke ez merda mevaje ke fîraq, nar oje seba min roja wusletî ya. Çunke Mewlana roja mergî sey şewa veyveyî pênas keno. Mewlana reyna vano ke awanşîyayîşê roj û aşmî çîre zîyan bibo, beno ke no seba taye kesan awanşîyayîş (xurûb) bibo labelê heman çi seb hîna kesan akewtîş (şurûq) o.

1.3.2. Wusleto Mecazî, Fîraqo Heqîqî & Fîraqo Mecazî, Wusleto Heqîqî

Rewşanê tēmîyankewte û alozan ra yew zî wusleto heqîqî û fîraqo heqîqî yan zî ver eksê ney o. Na rewşe de şîyayîş yan ameyîş mabeynê di terefan ra yewî rê wusleto mecazî labelê seba terefê binî fîraqo heqîqî îfade keno. Mîsale dunyaameyîş lîteraturê tesewufî de sey fîraqêko heqîqî yeno qebûlkerdene. Dunyaameyîşî reyde ruhê însanî wetenê xo yê eslî ra dûrî keweno û no dunya seba ruhê ke berîya wetenê xo yê eslî kenê sey xerîbistan û cayê surgunî yo. Qandê cû wefat û merg seba nê ruhan sey wuslet o. Sey nimûne kes eşkeno vajo ke mîrac vejîyayîş zî surgunîya dunya ra sey wusletê heqîqî rê gamêk yeno vînayene. Mîrac tesewuf de meqamo tewr berzo ke salik eşkeno bireso îfade keno û nê meqamî rê tenya peyxember resayo. Cenabê peyxembero ke surgunîya dunya de hepsî mendo sayeyê mîracî de yew hilmêk girewto û hesretê wetenê xo yê eslî kewêno (Pala, 2016: 322-323)

Heman dem de Mekke ra ver bi Medîne hîcretkerdişê peyxemberî zî no mînwal de eşkeno bêro nirxnayene. Milla Cimayo Babîj serr 1946î de Sêwregî de ameyo dunya, tehsîlêko klasîk ra dima perwerdeyêko modern zî vînayo. Babîj berhemanê xo zafane tirkî nuseno. Ey mewlîdê Osman Esad Efendî ser o xebate kerda û sîyerêko telîf zî nuştio. Milla Cimayo Babîj derheqê wusletê heqîqî de berhemê xo *Sîyerê Nebî* de wîna nuseno.

Nebî a şew şî keydê, Siddîqî, ê embazî
Xebera koçî da ci, pawitê nê mirazî.

Şewa bîn hurna vîcyay, bi dua û nîyazî,
Kafirî ujana di, geyray qandê înfazî.

Vînderdên û ewnayên, ê Mekkeyê şîrînî.
Nika uja di menden, merdimê bol şîrînî.

Ê warê pîr-baban ra, bol zî kewtîbîn dûrî.
Amey cayêndo xewle, bi zerryênda surûrî (Babîj, 2009: 35-37).

Milla Cimayo Babîj koçkerdişî di hetan ser ra tarîf keno. Heto yewin de peyxember esto û o nê şîyayîşî ra gelek xemgîn o. Heto bîn ra bawermendê ke Medîne de ey pawenê meraqê peyxemberî de yê. Peyxember her tim ewnîyêno xo pey ra û seba şîyayîşî zaf xemgîn beno.

2. Terenumê Wuslet û Fîraqî

Edebîyatê Klasîk yê Zazakî de sey edebîyatanê klasîkanê binan taye mezmûnî yenê tekrarkerdene. Mezmûn, bitaybetî edebîyatê dîwanî de yeno şuxulnayene. Fikir yan obje rasterast nêyeno labelê taye remz û îşaretê ke nê fikir yan objeyî bi şekilêko nimate temsîl kenê şuxulîyênê. Nê remz û îşaretî ke êdî bîyê klîşe sey mezmûn name benê (Pala, 2014: 298-299). Edebîyatê Klasîk yê Zazakî de nê tewir mezmûnî zêde yê labelê na xebate de nê mezmûnan ra tenya çend hebî sey mijarê na xebate ameyê weçînayene. Cêr ra mefhûmê sey *bîyayîş/wîladet*, *koç/hîcret-resayîş*, *dunya û merg* sey mezmûnî ameyê nirxnayene û derûdorê nê mefhûman de Edebîyatê Klasîk yê Zazakî de *wusleto mecazî*, *fîraqo heqîqî & fîraqo heqîqî*, *wusleto mecazî* yan *wusleto heqîqî*, *fîraqo mecazî & fîraqo mecazî*, *wusleto heqîqî* etud bîyo.

Her binbeş de nimûneyî deyayê û nê nimûneyî goreyê nê krîteran nirxneyayê. Binbeşan de nimûneyî goeyê krîteranê corî îzah bîyê. Îzahatan de fokusê mijarî goreyê çend hetan îzah bîyo. Fokusê ewnîyayox yan şîrovekerdoxî manaya mefhûmî vurîna.

2.1. Bîyayîş/Wîladet

Bîyayîş yan weledîyayîş dunyaameyişî îfade keno. Goreyê bawerî ruhê însanî Homayî hete de bîyo û badê ameyîşê dunyayî heta mergî ruh dunya de ase maneno. Goreyê rîwayetan Îsa peyxemberî vato ke ‘yew merdim heta di rey nêwelidîyo nêşkeno sirê melekutî ra hayîdar bibo’. Nê welidîyayîşan ra ewilê ci maya xorabîyayîş o, no weledîyayîş de îhtîyacê maye û pî esto labelê yê dîyin manewî yo. Badê welidîyayîşê ewilî însan mesabeyê merdeyî de yo û ganî xo newe ra însa bikero. Hedîsanê cenabê peyxemberî de dunya ra vejîyayîş, dunyayî terkkerdiş amey salixdayene û her tim verê mergî merdiş tawsîye bîyo. (Cebecioğlu, 2009: 131; Mutçalı, 2015: 1023; İşler & Özay, 2012: 1134). Mîyanê edebîyatê klasîkî de seba bîyayîşê cenabê peyxemberî sey cureyê mewlîdî berhemê musteqîlî nusîyayê. Seke yeno zanayene ke seba sewbîna kesan zî mewlîdnameyî nusîyayê.

Mîyanê na xebate de berhemê ke ameyê tedqîqkerdiş de berhemanê edebîyatê klasîkî de yan edebîyato modern ke bin tesîrê hîsanê dînî de nusîyayo de ameyîşê dunyayî wetenê eslî ra *dûrîkewtîş* û *fîraqî* îfade keno. Cêr ra nê rewşî nimûneyan reyde do îzah bibê. Gama ke gedeyê yeno dunya di rewşan ra kes eşkeno behs bikero. Rewşa ewilî de; sere de babî û dadîyê gedeyî, heme merdimê gedeyî welidîyayîşê gedeyî ra zaf keyfweşî yê. Çunke gede badê çend aşmîyanê zehmetinan ameyo dunya û no sebebe şayî yo. Yanî na rewşe seba derûdorê gedeyî *wusleto mecazî* yo. Heman çî kes eşkeno seba gedeyî vajo. Eke goreyê şîroveyê dînî-tesewufî îfade bibo, gede cismêko/bedenêko madî reyde, wetenê eslî ra *dûrî kewto* û no *fîraqêko heqîqî* û demkî yo. Badê heyatê cismanî, beden do orte ra wedarîyo û ruh reyna ageyro cayê xo û *wusletêko heqîqî* do bêro meydan.

Edebîyatê Klasîk yê Zazakî de bîyayîşê cenabê peyxemberî bitaybetî berhemanê mewlîdan de bi şekilêko vila ameyo nuştene. Ameyîşê cenabê peyxemberî terefê bawermendan ra sey wusleto heqîqî hesibîyayo. Çünke goreyê bawerîya Îslamî ameyîşê cenabê peyxemberî reyde heme dunya û bi taybetî bawermendî resayê muradê xo. Ê, bi welidîyayîşê cenabê peyxemberî ya şexs û cismê peyxemberî ya muşeref bîyê. Mewlîdî zafane sey merasîm saz benê û bitaybetî beşê merhebayî de heme beşdarî werzenê pay û seke cenabê peyxemberî teşrîfê merasîmî kerdo tewgeyrenê, destanê xo girê danê. Bawermendî nê demî rê hende ehemîyet danê ke wusletê heqîqî hîs kenê. Labelê no hal heman dem de seba peyxemberî -bêguman wîladetê eslî yê cenabê peyxemberî de no derbasdar o- fîraq o. Qandê cû fokusê şirovekerdixî/bawermendan mana û ehemîyetê hedîse vurînenê. Seke cor de vajîya, Edebîyatê Klasîk yê Zazakî de wîladetê cenabê peyxemberî, heqîqetê beyntarê wuslet û fîraqî de ramojneyayo. Cêr ra berhaman ra nimûne dehayê û nê nimûneyî şirove bîyê.

Edebîyatê Klasîk yê Zazakî bi Mela Ehmedê Xasî (1867-1951) û Muftî Osman Esad Efendî (1852-1928) reyde dest pêkerdo. Nê her di şairan/aliman perwerdeyêko klasîk tehsîl kerdo. Nê tehsîlî tesîrê ziwan û tedeyîyê berhemanê înan kerdo. Mela Ehmedê Xasî mewlîdêk nuştî û no berhem serra 1899î de Dîyarbekir de çap bîyo (Kirkan, 2018: 35-38). Mewlîdê ey mîyanê edebîyatê Zazakî de berhemê ewilî yo. Xasî, edebîyatê Zazakî de yew rayîrêke akerda û gelek edîban ser o tesîrdar bîyo. Xasî berhemê xo de derheqê welidîyayîşê cenabê peyxemberî yew beşêko musteqîl nuştî ke nameye nê beşî *Eno Mebhesê Welednayîşê Pê'xemberê Ma wo, Sellelalhû 'Ela Alîhî we Sellem* yo. Nê beşî de xêncê beyta tekrarî 19 beytî estê ke bi temamî prosesê wîladetê cenabê peyxemberî ra behs kenê. Cêr ra nê beşî ra qismê merhebayî çend hebî beytî dehayê.

Merheba ey sirri subhan merheba
Merheba ey rûhi rûhan merheba

Merheba ey fexri 'erşî merheba
Merheba nesley Qureyşî merheba

Merheba ya sahîbe'd-dîni'l-mubîn
Merheba ya sadîqe'l-we'dî'l-emîn

Merheba ya men sereyte bi'l-Herem
Merheba ya men denewte bi'l-qedem

Merheba ya qurrete 'eyni'l-wera
Merheba ya men nubi'te fî'l-Hira

Merheba ya 'alime'l-'ilmi'l-ezel
Merheba ya şafi'en yewme'l-wecel

Merheba ey rehmeten lî'l-'alemîn
Merheba ya men şefî'ul muznibîn

Wazenê ger ma xelasiyya tamam
Vatişê ma es-selatû we's-salam (Xasî, 2009: 39).

Ziwanê Xasî ziwanêko zehmet û giran o. Beytanê corênan ra dîyar o ke Xasî metnî de zaf çekuyê erebî û farisî şuxulnayê. Mîsale sirri subhan, rûhi rûhan, fexri 'erşî, nesley Qureyşî, sahibe'd-dîni'l-mubîn, sadîqe'l-we'dî'l-emîn, ya men sereyte bi'l-Herem, ya men denewte bi'l-qedem, ya qurrete 'eyni'l-wera, ya men nubi'te fi'l-Hira, ya 'alime'l-'ilmi'l-ezel, ya şafi'en yewme'l-wecel, ey rehmeten lî'l-'alemîn, ya men şefî'ul muznibîn çekuyê sewbîna ziwanan ra derbasê metnî bîyê. Îzafeyê sirri subhan de Subhan nameyê Homayî yo cenabê peyxember sey Sirê Homayî pênas bîyo; ifadeyê rûhi rûhan de cenabê peyxember sey ruhê heme wayîrê ruhan (heme mewcûdatî); ifadeyê fexri 'erşî keso tewr bi şeref û pesndeyaye ifade bîyo; îzafeyê nesley Qureyşî neslê cenabê peyxemberî vajîyayo; îzafeyê sahibe'd-dîni'l-mubîn cenabê peyxember sey wayîrê dînê akerdeyî pênas bîyo; ifadeyê sadîqe'l-we'dî'l-emîn cenabê peyxember sey qal û vatişanê xo de rast û durust tewsf bîyo; cumleyanê ya men sereyte bi'l-Herem, ya men denewte bi'l-qedem, ya qurrete 'eyni'l-wera, ya men nubi'te fi'l-Hira cenabê peyxember Qe'be de geyrayişê ci, linganê rayîr şîyayişê ci, roşnayîya çimanê mexlûqatan û mewcûdatan bîyayişê ci û Hîra de tenya mendişê ci vajîyayo ke nê heme terefê însanî yê peyxemberî ifade kenê; cumleyanê ya 'alime'l-'ilmi'l-ezel de ey zanayê ilmê ezeli, ya şafi'en yewme'l-wecel de ey şefatkarê roja tersî, ey rehmeten lî'l-'alemîn de aleman rê rehmet bîyayişê ci û ya men şefî'ul muznibîn de gunehkaran rê şefatkarî ya ci vajîyaya (Mutçalı, 2015; Erkan, 1999; Fîruzabadî, 2011). Nê çend hebî beytan de aseno ke Xasî welidîyayişê cenabê peyxemberî seba mewcûdatî û însanan çiqas muhîm vînenê. Metin de peyxember her hete ra ameyo pênaskerdiş û pesnê ci deyayo. Taybetmendîyê peyxemberî xarîkulade yê û ameyişê ey ancax wusletî ifade keno.

Dunyaameyîşê cenabê peyxemberî beyntarê mewcûdatî de sey roja roşanî ameyo teleqîkerdene. Heman rewşe eşkeno berhemê Osman Esad Efendî de zî tesbît bibo. Osman Esad Efendî serra 1903î de mewlîdêk nuşt ke no mewlîd badê mewlîdê Xasî mewlîdo dîyin o. Mewlîdê Osman Esad Efendî şeş beşan ra pê yeno. Nê beşan ra yew zî beşê wîladetî yo û nê beşî de qismê merhebayî esto. Seke verê cû vajîyabî qismê merhebayî tam dumyaameyîşê cenabê peyxamberî ifade keno. Osman Esad Efendî beşê merhabayî de dunya ameyîşê cenabê peyxemberî seba bawermendan sey wusletêk nuseno. Cêr ra beşê merhebayî mewlîdê Osman Esad Efendî ra qismêk deyayo.

Bado teyrên ame dest eşt paştde min,
Va: "Vilêna paşt û aş û naştê min."

Ame dinya a sa'et sultanê dîn,

Nûr di xerq bî va no erd û azmîn.

Heme mexlûqî dinê veynda û va:
“Merheba to rê Muhemmed Mustefa!

Merheba, ey merhemê pîzey kulan,
Merheba, ey serwerê pêxemberan!

Merheba, kanî şefa’et merheba!
Ti bi xeyr amey, to rê sed merheba.

Merheba, ti yê ricacî ma rûsiyan,
Merheba, dermanê qelbê nêweşan!

Merheba, ey mexzenê şer’ê Rebbî,
Merheba, ey serwerê hurna dinî!

Merheba, ey nûrê çimê ummetan,
Merheba, pêxemberê axirzeman!

Merheba, ey ti îmamê enbiyan,
Merheba, ey ti delîlê welîyan!”

A şewa ki Ehmed ame na dinî,
Erd û azmîn mijde da, va jewbînî.

Înan keyf kerd û vatên hurke jew
“Hemdûlîllah ame ma rê menga new.” (Kirkan, 2018: 187-188).

Osman Esad Efendî beşê wîladetî ra zaf ehemîyet dano nê beşî dergûdila nuseno. Mewlîdê ey de beşê wîladetî verê zewacê babî û dadîyê cenabê peyxemberî ra dest pêkeno. Babîyê peyxemberî ameyişê peyxemberî hewnê xo de vînen (Kirkan, 2018: 183-184), dima her aşmî de yew peyxember dadîya peyxemberî zîyaret keno (Kirkan, 2018: 184-185), dunyaameyîşê cenabê peyxemberî zaf muhîm o çunke o sey dîyarî erşawîyayo dunya, Homayî sînayeyê xo ra (hebîbullah) feraxat kerd û o erşawito dunya, nameyê ey zî asmênan de terefê Homayî ra neyayo pa (Kirkan, 2018: 185), demê zayene çend hebî xanimê qîymetbahayî sey Hewa, Asîye û Meryem hetkarîya dadîya peyxemberî kenê (Kirkan, 2018: 186-187), badê qismê merhebayî qundaxkerdişê peyxemberî û prosesê badê zayene îfade bîyo (Kirkan, 2018: 188-190). Beytanê corênan de cenabê peyxember sey; *sultanê dîn, merhemê pîzey kulan, ey serwerê pêxemberan, kanî şefa’et, ricacî ma rûsiyan, dermanê qelbê nêweşan, mexzenê şer’ê Rebbî, serwerê hurna dinî, nûrê çimê ummetan, pêxemberê axirzeman, îmamê enbiyan, delîlê welîyan* tewsîf bîyo. Seke aseno cenabê peyxember terefê Osman Esad

Efendî ra gelek sifatan a penas bîyo û ameyişê ey sey wuslet îfade bîyo. Heta şewa bîyayişê peyxemberî de erd û asmênî mizgînî daya yewbînî û na meseleya pîroze sebebe hemdkerdişî vînaya.

Mela Ebdulqadirê Muşeki serra 1968î de Çewlîg de ameyo dunya. Ey babîyê xo het de dest bi perwerdeyî kerdo û medrese ra îcazet girewta. Mela Ebdulqadirê Muşeki berhemê xo yê *Mewlîdê Nebî* serra 2020î de çap kerdo. Muşeki mewlîdê xo terzê sîyerî de nuştî, her prosesê cenabê peyxemberî kilmkî deyayo. Muşeki berhemê xo de Adem aleyhîselamî ra dest pêkerdo û heta îrtihal yanî wefatê peyxemberî nuştî. Berhemî de behsê hemil û wîladetê peyxemberî, hîcret û herbanê ey zî beno. Muşeki beşê merhebayî peynîya mewlîdî de bikar ardo.

Merheba tu r' sarî çimu ser umê
Merheba tu r' nurî çimu ti umê

Merheba Resulî îns u cinî ti
Merheba pêxemerî Allê pîlî ti

Ya Muhammed merheba la ti vêrîn
Ya Muhammed merheba ti axirîn (Muşeki, 2020: 78).

Muşeki, Xasî û Babîjî ra cîya beşê merhebayî seba wusletêko heqîqî bikar ano. Beytanê ewilî de û dimayênanê nê beşî de vatox vurîyêno. Kes qey vano ke nê beşî de nîdaya merheba terefê melekî ra yena vatene. Yanî yew wuslet ameyo meydan, peyxember îrtihalê dunyayê bînî kerdo û melekî ey bi no qayde reyde pêşwazî kenê. Metin de eslê xo de merheba û pêşwazîkerdene terefê bawermendan ra yeno vatene. Labelê qismê ewilî de kes eşkeno vajo ke nê vatenî terefê melekî ra vajîyayê çünke Muşeki mewlîdê xo de beşê merhebayî badê wefatî peyxemberî de ca kerdo.

Mela Mehemed Elî Hûnî serra 1930î de Hun de ameyo dunya. Ey perwerdeyê medrese tehsîl kerdo. Hûnî mîyanê şairanê edebîyatê klasîkî de edîbêko welûd û zaf hetin o. Hûnî zaf mijaran ser o berhemî nuştê û hîna zî nuştîşê xo berdewam o. Ey berhemê sey *Heketey Yûsuf û Zelîxa*, *Mewlîdo Zazakî*, *Mîrac û Wefatê Nebî*, *Weqayê Kerbelâ*, *Xezayê Uhûdî*, *Qesîdey û Qesîdey Peyxemberî* ûsn dayê. Hûnîyî perwerdeyêko klasîk vînayo û berhemanê xo de mezmûnanê edebîyatê klasîkî ramojneno. Mewlîdê ey de beşê merhebayî de dunyaameyişê cenabê peyxemberî wina mûnîyayo.

Pey selam a, pey merheba, vengo resa 'erd û sema
Hemîn yi ra va: "Merheba!", biwan mewlîd peyxemberî

Vaj "Merheba!", ti z' vaj qey yi r', vaj "Merheba!", vaj "Ya Wezîr!"
Vaj "Merheba!", vila rezî r', biwan mewlîd peyxemberî

Vaj "Merheba!", vaj "Merheba!", vaj "Merheba ya Mustefa!"

Vaj “Merheba ya Ehmeda!”, biwan mewlîd peyxemberî

Vaj “Merheba wahar Qur’an!”, vaj “Merheba wahar Furqan!”

Vaj “Merheba wahar îrfan!”, biwan mewlîd peyxemberî (Hûnî, 2004: 38).

Hûnî dunyaameyişê peyxemberî seba însanan û mexlûqatan sey wusletêko heqîqî îfade keno. Verê nê beşî de prosesê wîladetê peyxemberî biteferuat îzah bîyo û nê beşî de demê welidîyayişê peyxemberî de seferberbîyayişê heme meqlûqetan ra behs keno û wîladetê peyxemberî sey hedîseyêka bêhempa nîşan keno. Goreyê Hûnî heme cayê dunyayî de heme çîyan û kesan bi nîdayê *merheba* reyde wîladetê peyxemberî pîroz kerdo. Çünke na hedîse seba heme kes, heme çî û heme zamanan mizgîna tewre muhîm a. Hûnî peyxemberî sey *Wezîr*, *wahar Qur’an*, *wahar Furqan*, *wahar îrfan*, *wahar tac*, *şêyox Mîrac*, *ardox nimac* ûsn tewsîf keno. Nê sifetan ra *wahar Qur’an* û *wahar Furqan* heman çî îfade kenê ke peyxember wahîrê Qur’anî yo. Furqan zî nameyêkê bînî yê Qur’anî yo (Mutçalı, 2015: 698; Erkan, 1999: 1786; Fîruzabadî, 2011: 991-992). Curcanî furqanî sey zanisto ke cîyakerê beyntarê heq û batilî pênas keno, goreyê bawermendan xora fonksiyonê eslî yê Qur’anî no yo (1997: 172). Hûnî peyxemberî ra sey şîyoxê Mîracî û ardoxî nimac behs keno. Çünke peyxemberî Mîrac de şîyo asmênan û sey dîyarî nimaj xo de ardo (Yavuz, 2020: 132-135). Eşkeno bivajîyo ke peyxemberî mîracî ra warameyişê dunyayî ya, xo de sey Qur’an û nimajî di hebî dîyarîyê vîrardoxê wetenê eslî ardê.

Mela Orhan Sekaronij, Edebîyatê Klasîk yê Zazakî de edîbêko newe yo, berhemê ey serra 2023î de çap bîyê, qaso ke fehm beno şairêko welûd o. Mela Orhan serra 1973î de Germaw de ameyo dunya, perwerdeyê medreseyî tehsîl kerdo û mektebê resmî zî teber ra qedînayê. Heta nika di hebî berhemê Sekaronijî çap bîyê ke nînan ra yew *Sîyer* o. Lîteraturê edebîyatê klasîkî de berhemê ke hîkayeya heyatî cenabê peyxemberî sere ra heta peynî bi şekilêko menzûm yan mensûr behs kenê sey *sîyer* name benê (Pala, 2014: 408). Sekaronijî berhemê xo de derheqê wîladetê cenabê peyxemberî beşêko xoser nuşto û nê beşî de welidîyayişê ey 36 beytan de bi şekilêko belîx îfade kerdo. Sekaronijî destpêkê nê beşî de wina nuşto.

Hem wiladêt yi bib’ nîzdi yo

Hal pawitên behr u ‘erd u kerri wo

Amine yin ta îhna vateni

Hemil yê omî b’ aşmê şeşîni

Bad şeşîni yo raşt yê omî va

Tî eftêl dunya r’ hamile wa (Sekaronij, 2023a: 16).

Seke cor ra zî vajîyabî, *sîyer* goreyê mewlîdî cuya peyxemberî hîna hîra û biteferuat îzah keno. Sekaronij badê *wusletê mecazî* yanî dunyaameyişê peyxemberî îfade keno ke heme kaînatî mizgîn da yewbînî, melaîketî û însanan zî

no wîladet pîroz kerd. Sekaronij, peyxemberî sey *efdel* yanî *tewr bi fezîlet*, *tewr baş*, *tewr rind* tewsîf keno (Mutçalı, 2015: 706; Erkan, 1999: 1798; Sekaronij, 2023a: 16). Goreyê ey nê karî rê (welidîyayîş) her kes ecêb de mendo, rojhelat û rojawanê dunyayî de tijî akewta, qesrê Busrayî xilîyayê, adirê mecûsîyan şîyo hewna, gola Taberîstanî ziwa bîya ûsn mucîzeyî ameyê meydan. Alim û zanayê welatanê derûdormeyê Mekkeyî wîladetê peyxemberî şirove kenê û ney sey xeberêka ecêbe îzah kenê. Wusleto mecazî yê wîladetê peyxemberî terefê alim û zanayan ra pawîyayê, qandê cû na roje ameya pîrozkerdene.

2.2. Koç/Hîcret-Resayîş

Hîcret erebî de kokê هجر (hecere) ra yeno û no kok *terkkerdiş*, *eleqeyê xo qutkerdiş*, *dûrîkewtiş* ûsn manayan îfade keno (Mutçalı, 2015: 955; Erkan, 1999: 2365; Fîruzabadî, 2011: 1336). Hîcret de kes, çîyêk yan kesêk ra hetê bedenî, zîwanî yan qelbî ra dûrî keweno. No term taybetî seba Mekke ra ver bi Medîne barkerdişê cenabê peyxemberî yeno bikarardene (Önkal, 1998: 458-462). Hîcret de qet nêbo di kesî, di çî yan di mekanî estê. Beyntarê nê di kesan, çîyan yan rewşan de hîre cihetan de dûrîkewtiş yanî hîcret yeno meydan. Hîcreto yewin *bedenî* dûrîkewtişo ke no hîcret muqeyed o. Vurîyayîşê mekanî heskerdişî orte ra nêwedarneno. Hîcreto dîyin *ziwanî* yo. Vatiş, qalîkerdiş û fikirîyayîşî de dûrîkewtişî îfade keno. No hîcret goreyê hîcretê bedenî/fizîkî hîna giran û cidî yo. Hîcretkerdox goreyê rewşa xo ya ewilî vatenanê cîyayan vano û heta cîya fikirîyêno. Hîcreto hîrêyin û tewr cidîyê ci *qelbî* yo. Keso ke çîyêk, kesêk yan rewşêke ra qelben dûrî keweno hîcretêko bingeynî pê ano (Uludağ, 2016: 169).

Koçkerdiş yan hîcretkerdiş dîyardeyêkê wuslat û fîraqî yo û zafane bi fîraqî ya têkildar o. Koçkerdişî û hîcretî de dûrîkewtiş û terkkerdiş esto. Heto bîn ra her hîcret xo reyde resayîşî zî îfade keno. Çünke hîcret, koçkerdiş, terkkerdiş yew rewşe ra dûrîkewtişî îfade keno, heman dem de hetê bînî ra resayîş o. Hîcret yew rewşe ra seba sewbîna rewşe koçkerdişî îfade keno, hetêk ra yew rewşe terkkerdişî labelê hetê bînî ra seba sewbîna rewşe resayîşî û wîsalî îfade keno. Mîsale cenabê peyxember gama ke Mekke ra ver bi Medîne koç keno, Mekke ra dûrî keweno labelê nêzdîyê Medîne beno.

Lîteraturê dînî de hîcret seba barkerdişê cenabê peyxemberî yeno bikarardene. Serra 610î de peyxemberî Mekke ra ver bi Medîne koç kerdo. Seke yeno zanayene prosesê koçkerdişî verê serra 610î dest pêkerdbî labelê no pêvajo bi koçkerdişê peyxemberî reyde qedîyayo (Önkal, 1998: 458-462). Hîcret sey termêk tarîxê Îslamî taye mefhûmî zêde kerdê. Kesê ke hîcret kenê sey *muhacîr*, kesê ke wetenê xo de muhacîran rê wayîrîya keyeyî kenê sey *ensar* name bîyê (Özel, 1998: 462-466). Edebîyatê klasîkî de hîcret hîna zêde seba dûrîkewtişê aşîq û maşûqî yeno şuxulîyaynene. Kes eşkeno vajo ke muhacîr sey aşîq, ensar zî sey maşûqî şirove bikero. Maşûq û aşîq her tim mîyanê yew hesretî de yê. Xora edebîyatê klasîkî de na tema daîma yena vatene. Halê eşqî halêko hîcretî yo, aşîq her daîm muhacîr, maşûq[e] her tim dûrî y[a].

Cêr de mefhûmê hîcretî goreyê hîrê babetanê hîcretî etud bîyo. Hîcret (dûrîkewtiş, cîyakewtiş, terkkerdiş, dûrîkewtişê mecbûrî yan keyfî) goreyê hîcretê *bedenî*, hîcretê *ziwanî* yan hîcretê *qelbî* dabeş bîyo. Mîjarê edebîyatê klasîkî zî no mînwal de ameyo nîrxnayene.

Mela Ehmedê Xasî gama ke peyxember deyêno dadîya şitî ney sey *fîraqo mecazî* îfade keno. Eslê xo de no yew halê dûrîkewtiş û hîcretî yo. Mîyanê Ereban de seba zîwanê fesîhî bander bibê, mîyanê hewayê pakî de gird bibê û nêweşîye ra dûrî bimanê heta demêk teber de bimanê gedeyanê şitî danê maya şitî. Peyxember zî no rîd ra deyyayê Helîmeya Se'dîyan û çend serrî aye hete de mendo (Çubukçu, 1997: 338). Şîyayîşê gedeyî seba dadî sey *fîraqo mecazî* hesabîyayo. Xasî ney wina îfade keno.

Amina va hewni min de bî beyan
Go bido yê şit Helîmay Se'dîyan

Çende rocî be'di cû yew kariwan
Ame Mekke name vatê Se'dîyan

Yîne dir bî hem Helîmay Se'dîyan
Şî xo rê berd seyyidê însan û can

Ay zî yew lacêke qic bî Dumrete
Hur dî p'ya bî şitwerê ay hurmete (Xasî, 2009: 42).

Mewlîdê Xasî de *dayîşê dadîya şitî* sey beşêk ameyo vatene. Nê beşî de mucîzeyê ke ameyê meydan zî vajîyayê. Hîsîyatê dadîya peyxemberî ameyo dayene. Goreyê rîwayetan meseleya *şegu's-sedr* (Sûreya İnşîrah) peyxemberî nê demî de ameyo meydan labelê Xasî na mesele ra behs nêkeno û dima zî gedeyî Mekke de teslîmê dadîya ci keno. No eslê xo de yew hîcretê *bedenî* yo û gede demêko muweqet de dadîya xo ra dûrîkewto. Beyntarê dadî û gedeyî de heskerdiş nêqedîyayo, heman dem de mabeyne dadîya şitî û gedeyî de yew heskerdiş peyda bîyo. No hîcretêko *bedenî* û demkî yo. Nê hîcretî de demo ke gede maya eslî ra gêrîyêno no hal seba Amîne *fîraqo heqîqî* labelê seba Helîme *wusleto mecazî* yo; demê apey dayene de rewşe vurîyêna û apeydayîşê gedeyî seba Helîme *fîraqo heqîqî* û seba Amîne zî *wuslato heqîqî* yo. Gede çend serrî welatê eslî yê xo ra (Mekke yan virara maya xo) dûrî bibo zî, hetê qelbî ra hîcret nêkerdo, wetenê xo ra dûrî nêkewto.

Osman Esad Efendî meseleya Mîracî ya cenabê peyxemberî ra behs keno. Sehneyo ke Osman Esad Efendî teswîr keno *wusleto heqîqî* û mutleqî nîşan dano. Beşê mîracî de wina ravêreno.

Çaxo Cebraîlî dir kerdin kelam,
Ame Refref Ehmedî rê da selam.

Va uja ra rew girot ê Refrefî,
Berd bi ‘erşî ser di rona o nebî.

No fim ame veng û va: “Ya Mustefa,
Ya hebîbe’l-mucteba, xeyre’l-wera”

Bê, bi to rewna yo ez ‘aşîq biyan,
Kerdo koley to min çendê îns û can.

Şî bî nezdî o va Refref c adi mend,
Ehmedî ra mîm werîşt û mend Ehmed.

Bêhes û herf, a şew ê neway hezar,
Mustefay dir kerdi qîse ey kanî yar (Kırkan, 2018: 197-198).

Beytanê corênan de mîyanê zemanêko muqeyed de -çunke peyxember her çiqas tebere zemanî de bibo zî goreyê wextê dunyayî demêko kilm de şîno mîrac-Homayî vînen, her di pîya derbasê teberê zemanî benê. Nê demî de beyntarê peyxemberî û Homayî de (aşîq û maşûqî de/wasil û mewsûlî de) *wusleto heqîqî* û pêresayîşêko mutleq ameyo meydan. Seba ke *wusletê heqîqî* û mutleqî nîşan bikero Osman Esad Efendî vano ke mîm (م) werîşt û Ehmed mend. Ehmed nameyê peyxemberî yo û alfabeya erebî de sey احمد yeno nuştene. Ehmed bi manaya *tewr baş*, *tewr rind*, *tewr pesndeyaye* ûsn yeno (Pala, 2014: 13). Gama ke nê nameyî ra herfa م werzo احد maneno ke no zî sîfetê Homayî yo û Ehmed *tenya*, *yew*, *yewane* ûsn manayan îfade keno (Mutçalı, 2015: 18). Beyta cêrene ra fehîm beno ke beyntarê Homa û peyxemberî de xêncê qal û herfan dayîşgîrewtîşêk ameyo meydan. Homa û peyxember bîyê yew ke no lîteraturê tesewufî de sey *wehdetu’l-wucudî* name beno. *Wehdetu’l-wucud*, heqî ya yewbîyayîş û heme çî çîmanê ey r vînayîşî îfade keno. Heme çî heq û tecelîyê ey ê (Pala, 2014: 469; Uludağ, 2016: 371).

Mela Ebdulqadirê Muşeki mewlîdê xo de hîcretê peyxemberî beşêko musteqîl nuseno û nê beşî de behsê *fîraqê mecazî* keno. Mekke ra ver bi Medîne şîyayîşê peyxemberî seba heme Muslumanan muhîm o û no seba peyxemberî *fîraqo mecazî* seba muslumanan *wusleto heqîqî* yo.

Îslamu qê dîn xu dî eziyet
Muşrîku rasna yin zafi zehmet

Pêxemer una sehabe yi nêeşkenî
Kafirû dest id yi tim qehrî benî

Pêxemerî îzîn sehabun xu yi da
Va şîma eşken şîyerê Medîna la (Muşeki, 2020: 66).

Seke beytanê corênan de dîyar beno, ver bi Medîne hîcretê peyxemberî zulim û zordarîya muşrîkanê Mekkeyijan ra yo. Înan gelek zehmetî, zulim û zor

dayo bawermendan, bawermendan zî mîyanê çend serran de Mekke ra ver bi bajaranê derûdorî hîcret kerdo. Bawermendan ra gelek kesan hîcret kerdo dima peyxemberî û embazê ey (Ebûbekir) koç kerdo. Herçiqaqas bereymendişê peyxemberî qandê ewlehîya embazanê xo temînkerdiş bîbo zî kes eşkeno vajo ke mîyanê çend serran de peyxemberî hetê derûnî ra xo amadeyê şîyayişî (terkkerdişê wetenî) kerdo. Hîcretkerdişê peyxemberî *hîcretu bedenî* yo, peyxember qelben Mekke de mendo, her tim hesretê ucayî anto. Reyna zî hîcret tarîxê Musلمانan de yew nuqtayêka bingeyin a. Bawermendan no sey wuslet hesibnayo.

Meseleya hîcret, dûrîkewtiş û koçkerdişî rê Hûnî sewbîna mecra ra ewneno. Seke cor ra zî îfade bîbî Hûnîyî bi nameyê *Heketey Yûsuf û Zelîxa* yew berhem amade kerdo û meseleya meşhûr a Yûsuf û Zuleyxa [Zelîxa] nuşt. Yûsuf peyxember lajê Yaqûb peyxemberî yo. Yaqûb peyxember wayîrê diwês lajan o labelê mîyanê lajanê xo de tewr zêde Yûsufî ra hes keno. Rojêk Yûsuf hewnê xo de vînen ke yewendes gêrestareyî, tijî û aşmî secdeye ey kenê. Nê hewnê xo babîyê xo rê vano labelê babîyê ey îqaz keno ke nê hewnê xo ra behsê tu kesî nêkero. Birayê Yûsufî bi dekûdolaban a ey xapênenê û erzenê bîrî mîyan, îşliga ey zî mîyanê gonî de viradanê û yenê Yaqûbî rê vanê ‘ma kay kerdêne, vergî Yûsuf werd’. Yaqûb qehrê Yûsufî ver çîmanê xo vîndî keno û beno kor. Badê zaf macerayan Yûsuf bîrî ra yeno vetene, sey kole roşîyêno Misir, uca de beno koleyê wezîrî, cinîya wezîrî ey rê hîle kena û vana ke Yûsufî qesdê namûsê min kerd, ver bi nê îftîrayî Yûsuf keweno zîndan, uca de tebîrê hewnanê zîndanîyan keno û zîndan ra reyêno dima zî beno wezîrê hukumdarê Misirî. Peynîya mesele de Yûsuf birararanê -êyê ke o eştbî bîrî mîyan- xo eşkera keno, îşliga xo rişeno babîyê xo rê û çîmê Yaqûbî abîyênê. Yûsuf û Zelîxa, cinîya wezîrî ke îftîra bi Yûsufî kerd bî, peynî de pê ya zewecîyênê. Edebîyatê klasîkî de metaforê Yûsuf û Yaqûbî hesretîmendiş, dûrîkewtiş û hîcranî îfade keno (Geverî, 2013). Hûnî nê metaforê eşqî, hîcret û hîcranî wina îfade keno.

Yew ruc lacî bî asparî, va “Bawko, ma şin cey warî,
Yûsuf berşaw wa buk yarî”, hey veyn Yûsufî Ken’anî.

Ye’qûb va “Cey warû dur î, tersen vergî z’ Yûsuf bûrî”,
Yîn va “Meters, ma ûn tu ri”, hey veyn Yûsufî Ken’anî.

Yîn Yûsuf eyşt zerrey bîr, ‘eceb ena yena kûm vîr,
Yî şûn d’ amey, yî bermey pî r’, hey veyn Yûsufî Ken’anî (Hûnî, 2004: 57-58).

Beytanê corênan de birayê Yûsufî şînê babîyê xo ra destûr wazenê ke Yûsufî xo de berê. Yûsufî xo reyde bene û ey erzenê bîr. Bîr, wetenî ra dûrîkewtiş û fîraqî rê îşaret keno. Surgunîya Yûsufî badê nê hedîseyî dest pêkena û Yûsuf demêko derg hem babîyê xo ra hem wetenê xo ra dûrî keweno. Hûnî, Yûsufî sifte babîyê ey Yaqûbî rê dima welatê Ken’anî rê nîsbet keno. Yûsuf ancax nîsbetê babî û welatî

bibo asta fîraqê Yûsufî pênas bena. Çünke fîraqê ey tenya babî ra nîya heman dem de o wetenê xo ra zî dûrî kewto.

Des birey Yûsuf Peyxembêr, des devû ra amey vêr bêr,
Yûsuf tîn id weş dey xebêr, hey veyn Yûsufî Ken'anî (Hûnî, 2004: 64).

Des hebî birayê ey seba *wusletê mecazî* şînê Misir û uca de rastê ey yenê. Yûsuf biraranê xo reyde yeno têhet labelê waştîşê ey babîyê xo û welatê xo yo. Yûsuf û des hebî birayî mecazî komê pê ser benê. Yûsuf wazeno ke bireso amacê xo yê eslî.

Birey bînî z' amey resey, yew deme mênd, barî weney,
Vêr xu tada hetî ucey", hey veyn Yûsufî Ken'anî.

Welat xu ra yîn xu wepîşt, hey na rahar Misîr tepîşt,
Resay Misir, Ye'qûb rûnişt, hey veyn Yûsufî Ken'anî.

Ye'qûb va "Ez bîya rehet, Homa ma rî kerdû rehmet,
Ma rî kerdû tamam nî'met", hey veyn Yûsufî Ken'anî (Hûnî, 2004: 69).

Beytanê corênan de hîcretê Yûsufî û hîcranê Yaqûbî qedîyayo û nê her di resayê yewbînan. Yaqûbî hîcran û fîraqê Yûsufî çimê xo vîndî kerdîbî û bîbî ema, badê resayîşê îşliga Yûsufî çimê ey reyna abîyayê. Dûrîkewtiş û hîcretê Yûsuf û Yaqûbî-Yûsuf û Ken'anî çend hetan ra eşkeno bêro şirovekerdene. Yûsuf erzîyayo bîr û no sey *hîcretî bedenî* yo; Yûsuf û Yaqûb tu rey hetê qelbî ra pê ra dûrî nêkewtê, yanî *hîcretî qelbî* nêameyo meydan; Yaqûbî çimê xo muweqeten sey *fîraqo mecazî* vîndî kerdê; Yûsuf Ken'anî ra dûrî kewto ke no *fîraqo heqîqî* yo; birayê Yûsufî *hîcretî lefzî* ya wetenê xo ra dûrî kewtê ûn çî eşkenê bîrê vatene (Geverî, 2013). Hedîseya Yûsuf û Yaqûbî her merheleyê hîcretî bidetay yena mûnitene.

Sekaronij sîyerê xo de derheqê hîcretê peyxemberî de yew beşêko musteqîl nuseno. Fermanê peyxemberî ra dima gelek embazanê ey ver bi Medîne hîcret kerdo. Sekaronij vano ke xora Mekke de xêncê Elî, Ebûbekir û peyxemberî tu bawermendî nêmendîbî. Seke cor ra zî îfade bîbî, peyxemberî waştêne ke heme bawermendî Mekkeyî terk bikerê û o zî badê cû şiro. Sebebêko bîn zî peyxemberî hetê derûnî ra xo amadeyê terkkerdişê Mekkeyî kerdê.

Pêğembêr emir da sehabon Mekki
Hîcret bikên hîrî çahar tek u tek (Sekaronij, 2023a: 148).

Hem muşrik koti dima Pêğmêri
Ha ayî g' pêya b' ha ayî g' suwari

Pêğembêr di çiqas zahmet u cefa
Yî r' nimend rehata u çê yo sefa

Şîrîn çîn inson ir wî zê watên

Mekke caverda bî derd u ğem (Sekaronij, 2023b: 158).

Sekaronij dergûdila behsê hîcretê peyxemberî keno û seke beytanê corênan de aseno Mekke ra hîcretkerdiş seba peyxemberî zaf zehmet o. Ey Mekke ra hîcretê bedenî kerdo labelê tu rey vatene û qelbê xo ra Mekke nêveta. Peyxemberî vatişanê xo de her tim behsê welatê xo kerdo û qelben welatê xo ra dûrî nêkewto. Seba cû no fîraqêko mecazî yo.

Sêni awk wazena ‘erdêko têşon
Sêni wer wazen pizêko vêşon

Ruej u se’at u zamon viyertên
Hinê çim yin iz rıyon ra menden (Sekaronij, 2023a: 174).

Sekaronij behsê prosesê hîcretî keno labelê reyêk ra fokusê hîcretî Mekkeyîj û peyxemberî ra tadano Medîneyîjan ser. Sekaronij Medîneyîjanê ke bendeyê ameyişê peyxemberî yê sey veyşan û teyšan teswîr keno. Erd senîn pabeyê awe yo, pîze senîn pabeyê werdî yo Medîneyîjî zî o tewir bendeyê ameyişê peyxemberî yê. Hîcret û resayîş di rewşê îzafî yê; seba peyxemberî hîcret Mekke ra dûrîkewtiş û hîcran o labelê seba Medîneyîjan na raywanîye resayîş û wuslet a. Sekaronij ney bi şeklêko belîx îfade keno. Peyxember mîyanê derd û xemî de yo labelê Medîneyîjî bi çar çiman a pabeyê nê resayîşî yê.

2.3. Dunya

Dunya erebkî de kokê دنو (dena) ra zêdeyayo û bi manaya nêzdî, tewr nêzdî, nêzdîbîyayîş, cayo nêzdî de mendiş, cêr, tewr cêr, zelîl, sefîh, bêxeyr ûsn şuxulîyêna (Mutçalı, 2015: 316; Erkan, 1999: 1173-1174; Fîruzabadî, 2011: 449). Cuya tewr nêzdî û cêre sey dunya name bîya ke cuya peyê na cuye de ya sey axîret yena zanayene. Lîteraturê rojhelatî de çekuya dunya zafane metaforanê xiraban îfade kena û çekuyêka pejuratîf a. Qur’an mefhûmanê dunya û axîretî tim pîya şuxulneno û axîretî hîna baş û rind teswîr keno (Sûreya E’la, 17). Taye cayan de zî bextewarîya dunya û axîretî pîya yeno îfadekerdiş û bawermendan rê nê her di bextewarîye pîya yenê salixdayene (Sûreya Zîlzal, 7-8). Beyntarê nê her di cuyan de tercîhê bawermendan her tim [ganî] terefê axîretî ra yo. Dunya însanî Homayî ra dûr keno û însanî fineno xeflet. Mîyanê mutesewifan de dunya sembolê xirabî yo (Uludağ, 2016: 112).

Sewbîna cografyayan de vilabîyayîşê Îslametîye dima mîyanê bawermendan de dejenerayonî dest pêkerdo. Bawermendan ra qismêkê ci meylê mal û mulkê dunyayî kerdo labelê ver eksê ci qismênê bawermendan zî dunya ra rî tadayo, verê xo dayo axîretî. Bi nameyê *zahîd-zuhhad* yew zumreyêk vejîyayo meydan, nê kesî terefê şarî ra sey ewlîya ameyê qebûlkerdene. Nê kesan ra taye ci îfrat kerdo û gelek ser şîyê. Hemberê nînan de ehlê tesewufî yê mutedîlî zî vejîyayê orte. Xezalî mutesewifanê mutedîlan ra yo û fikirê tesewufê mutedîlî zafane terefê ey ra sistematîze bîyê. Goreyê ey însan ganî dunyayî rê zî rîayet bikero, no hewceyîyê ruh û bedenî yo. Însan dunyayî ya sey madî û manewî di cîhetan ra

îstîfade keno (Uludağ, 1994: 22-25). Heskerdişê dunyayî fitrî yo û însan mergî ra biterso zî cuyayîşî ra hes keno. Axîret zî nê dunyayî ra qezenc keno.

Xezalî goreyê heskerdişê dunyayî însanan hîrê beşan ser ra teqşîm keno. Beşê ewilî de *kesê ke tenya dunyayî rê iltîfat kenê û qet goş bi axîretî nêkuwenê*. Zafê însanan nê kategorî de yê. Beşê dîyin de *kesê k axîretî rê iltîfat kenê û dunyayî ya eleqeyê xo birnenê*. Beşê hîrêyin de *zî kesê ke heqê dunyayî zî heqê axîretî zî danê* estê. Goreyê Xezalî kesê meqbûl û başî nê kesê beşê hîrêyînî yê. Bawermendî beyntarê nê her dîyan (dunya û axîretî) de hemsencîyêk virazenê û seba yewî, ê bînî ra derbas nêbenê (Xezalî, 2005)

Zahîd û abidî, dunya û axîretî sey di wesnîyan tarîf kenê. Wesnî senîn nêşkenê yewbînan de pê bikerê, dunya û axîret zî pê nêkenê. Dunya û axîret sey rojhelat û rojawanî yê; yewî ra nêzdî bîyayîş, ê bînî ra dûrîkewtiş o. Nê di cuyan ra yew mamûr bibo, o bîn xirabe beno. Heyatê dunyayî vernîya resayîşê heq û rastî de yew asteng o. Eke zahîdî biresê meqamê masîwayî êdî derheqê dunyayî de çîyanê xiraban vatene ra dûrî vîndenê (Uludağ, 1994: 22-25).

Mela Kamilê Puexî serra 1938î de Çewlîg de ameyo dunya. Ey gelek medreseyan de perwerdeyêko klasîk vînayo. Puexî berhemanê xo terzê klasîkî de nuseno û heta nika di hebî berhemê ey çap bîyê. Nînan ra yew mewlîdê û o bîn zî *Dîwanê* ey o. Puexî, Çewlîg ra yo. Ey medrese de perwerde vînayo û demêko derg melayîye kerda. O hîna zî memleketê xo de cuyeno û nuştîşî rê dewam keno. Puexî berhemê xo de mijaranê wuslet û fîraqî kontekstê *merg, welidîyayîş, dunyayî* de şuxulneno. Ewnîyayîşê Puexî goreyê zahîd û abidan hîna nerm û maqul o.

Dunya zaf rind a delal a
Hewa wenik ab zelal a
Kum yo g' virard kerda pîra
Mêrg nêverdu xu r' bun tî ra

Dunya ha tu xapînena
Dost a şîrîn wiyena
Miyun dostun d' tu vîcnena
Tî mirên ya ca d' munena

Dunya ha dewr virazena
Çi weqt va vîndir vîndena
Ya z' fani ya bedîlyena
Beqa yo tên ir munena (Puexî, 2020: 24).

Puexî dunyayî beyntarê başîye û xirabîye de nirxneno. Dunya cayêka baş a, rind û delal a. Heman dem de dunya xapînok a, dost û şîrîn asena labelê kesî mîyanê dostan ra vejena, kes mireno û dunya ca de manena. Puexî derheqê dunyayî de ewnîyayîşêko mutedil reyde tewgeyreno. Dunya baş a, rind a labelê ganî bêro zanayene ke dunya her tim dewr kena û însanî sey arîye tehnenê. Dunya

Însanî xapênena, her tim vurîyêna, bedilîyêna, dunya fanî ya. Puexî dunyayî de yew ewnîyayîşêko rastîye keno, xirabîye û rindîya dunyayî pê reyde îfade keno.

WK Merdimîn zî Çewlîg ra yo. Merdimîn serra 1954î de Çewlîg de ameyo dunya. Merdimînî terzê neweyî ya mijarê edebîyatê klasîkî nuştê. Ey mewlîdê Mela Kamilê Puexî, mewlîdê Mela Mehemedê Muradan û mewlîd û qesîdeyê Mela Mehemed Elîyê Hûnî amadeyê çapî kerdê. Yanî Merdimîn terzê edebîyatê klasîkî zano. Heta nika di hebî berhemê ey ê şîran ameyê weşanayene. Nînan ra yew bi nameyê *Dîwan* (2004 û dima 2015) û o bîn zî *Dîwano Nêmcet* (2015) o. Merdimîn dunyayî rê çimêko zahîdane ewneno.

Bêzerrî û bêhaya
Rayîrê ma kewt na dinya
Ma barê xo na ro
Merg ra cu, cu ra merg
Hem cu hem merg... (Merdimîn, 2015b: 19).

Merdimîn ameyîşê dunyayî sey *fîraqo heqîqî* teswîr keno. Goreyê ey, o bêzerrî yanî bêwaştîş û bêxeber erzîyayo dunya. Haya û waştîşê ey nê bîyayîşî de çinî yo. Qandê cû derheqê dunyayî de tu îştahê ey zî çinî yo. Ameyîşê dunyayî de barê xo ronayo labelê Merdimîn *merg ra cuye & cuye ra mergî* fehîm keno. Her çî tîmîyanê yewbînî de eşkeno bêro îdrakkerdene. Dunya seba mergî cayê amadebîyayîşî yo û merg zî qîymet û erjêk dano cuye. Her di pîya yew mana îfade kenê.

Seni ke ez tena ameya na dinya
Tiya ra barkerdişî mi zî do tena bo
Rayîr derg o
Bar giran o
Taquet çin o
La, çi heyf ke
Heqbe zî veng û varit o (Merdimîn, 2015b: 37).

Merdimîn risteyanê corênan de hîna tewrêko zahîdanê (heta reşbînî) ya nuseno. Seba Merdimînî dunya cayê surgunî yo û o tîya de bîyayîş ra qet memnun nîyo. O tenya ameyo no dunya û o do tenya nê dunya ra bar bikero. Dunya seba ey hêgaya axîretî ya û o qayîl o ke heqîbeyê xo tîya degîro. Merdimîn dunyayî sey rayîra derge, baro giran, bêtaquet, tikûtenya û keda berhewa vînenê. Dunya rê temahê ey çinî yo. Seba ey wetenê eslî yanî alemê erwahî/aleme ruhan ra dûrîkewtiş sey *fîraq* pênas bîyo (Kaya, 2010: 54). Merdimîn zî dunyaameyîşî sey *fîraq* û dunyayê axîretî sey *wuslet* hesabneno.

Sekaronij, derheqê dunyayî û cûya dunyayî de sey Merdimînî fikirîyêno. Dunya cayê surgunî û firqetî yo. Dunya weş a labelê heman dem de xapînok a. Ganî nê taybetmendîyî bidîqet bêrê nirxnayene.

Dunya weş a eg tî weş raviyarn

Bena teng eg tı nizon bıviyarn
 Tedı nimend wı qırn verin
 Dunya serbın kerd qırnı pêyin

Wa dunya şıma çoy nixapın
 Kom omı caverda in axpın
 Inê inkê kom bêşk bıxapın
 Kueşê sêr id berz mindêr yin (Sekaronij, 2023: 54).

Goreyê Sekaronijî dunya weş a labelê yew qeyd fineno û vano ke eke ti weş bıviyarnê dunya baş a. Dunya cayêko muweqet û demkî yo, azbetê verênî heme serûbinê pê bîyê û şîyê. Azbetê peyênî do zî şîrê û vîndî bibê. Dunya xapînok a, kamo ke nêxapîyayo axîret de cayê ey berz o. Sekaronij dunyayî cayê hîcretî, fîraqî vînenê. Dunya beyntarê alemê ruhan û axîretî de pirêk a, bawermend nê pirî bi serkewtiş derbas keno. Dunya cayêko meqbûl nîyo, bi ney a zî ganî dunya ra baş bêro îstîfadekerdene. Derheqê dunyayî û manaya dunyayî de edîbê klasîk yê Zazakî kê m zêde sey yewbînî fikirîyênê.

2.4. Merg

Merg, qedîyayîşê heyatî û orte ra wedarîyayîşî îfade keno. Çekuyê erebkî mewt, fewt, wefat zî Zazakî de heman mana de yenê şuxulîyayene (Mutçalı, 2015: 845; Erkan, 1999: 2052; Fîruzabadî, 2011: 1201; Ce'ferî, 1394: 632). Merg, cesedî ra terkkerdişê ruhî reyde heyatê madî ra vejîyayîş û dunyayî terkkerdişî îfade keno. Mahîyetê mergî kultur ra kulturî vurîyêno û merg zafane axîret de mehkemebîyayîşê guneh û sewaban reyde pênas beno. Taye kulturan de merg berê dunyayî û axîretî yo. Taye kulturan de zî merg bitemamî orte ra werzîyayîşî îfade keno.

Qewmanê kehanan de merg sey xezebê Homayan bawer bîyo, seba berterafkerdişê nê xezebî sîhîr reyde ruhî beden teriknayo. Ge ge tersê merg û cesedî ra însanan kesê ke sekerat de yê tenya veradayê. Mîsîro kehan de bawerîya axîretî û cûya badê mergî esta. Seba cû cesedî/naaşî ameyê mummyakerdene. Rojhelato dûrî de merde bi çîyanêrojaneyan heta koleyanê ci reyde defin bîyê. Nê tewir dîyardeyî bawerîya axîretî rê îşaret kenê. Yûnan de zî heman bawerî esta (Gürkan, 2007: 32-34).

Aryanîyan de bawerîya heyatê badê mergî esta. Axîret de rindî Ahura Mazda reyde cuyenê labelê xirabî cehennem de yê. Seba towbekaran zî *Pirê Çînwadî* (Ceniwer) esto û towbekarî nê pirî ra derbasê cennet î benê (Gürkan, 2007: 32-34; Kanar, 2010: 573). Lîteraturê Îslamî de no pir sey *sîrat* yeno namekerdene. Nê pirî ser o rind û xirabî yewbînî ra cîya benê. No pir heta cennet şîno û cehennemî ser o roneyayo. Rindî nê pirî ra derbasê cennet î benê, xirabî zî uca ra kewenê cehennem (Yıldırım, 2008: 619).

Xezalî goreyê waştîşê mergî însanan hîrê beşan rê teqşîm keno: *gunehkarê ke dunya ra hes kenê, towbekarê ke gunahanê xo ra pişman bîyê û arîfî*. Gunahkarî

mergî nêanê xo vîrî, towbekarî mergî xo vîr ra nêkenê. Nê her di grûbî zî qayîl nîye ke bimîrê. Arîfî her daîm mergî xo vîrî de tepêşenê, merdîşî reyde zî qayîlê biresê Homayî. Însanê ke meşxeleyê dunyayî reyde axîretî keno vîrî, temehîye û pexîlîye kenê ganî mergî tim yad bikerê (Uludağ, 2007: 37-38). Tesewuf de merg di şekilan ser ra tarîf bîyo. *Mergo siruştî* yeno her însanî ser û her nefis do ney tehm bikero. *Mergo îxtîyarî* zî verê mergî heme arzû û waştîşanê xo ra dûrîkewtîş û seba axîretî xo amadekerdîşî îfade keno (Uludağ, 2016: 284). Edebîyatê Klasîk yê Zazakî de merg kontekstê *mergê îxtîyarî* de ameyo şuxulîyayene. Merg vernîya axîretî de sey berêk teleqî bîyo û însanî seba resayîşê heqî ganî nê berî ra derbas bibê.

Rîtuêlê mergî cîya şekilan de ameyo yadkerdene. Mewlana mergî sey Şeb-î Arûs yanî sey şewa veyveyî pênas keno. Yadkerdîşê *mergê roja Mewlanayî* de taye mewlewî ney puf kenê û rebab cenenê (Uludağ, 2007: 37-38). Seke fehîm beno mewleyî na roja sey mergî dunyayê fanî ra reyayîş, fîraqî ra xelisîyayîş û wusletî rê berêk vînenê.

Mela Aziz Beki serra 1954î de Çewlîg deameyo dunya. Beki terzê klasîkî ya medrese wenda û heman dem de tehsîlêko modern ra zî derbas bîyo. Xeynê ehlê medreseyî bîyayîşî eynî wext de Beki akademisyen o. Beki terzê edebîyatê klasîkî de gelek eserî nuştê. Beki meseleya wuslet û fîraqî, terefê heqîqetî de wusletî sey merg û resayîşê Heqî tarîf keno, fîraqî zî Heqî ra dûrîkewtîşî ya îfade keno. Mîyanê berhemê xo derbarê welat, welatî ra dûrîbîyayîşî û hesretê welatî de taye şîîrê ey estê. No terefê mecazî yê wuslet û fîraqî temsîl keno. Beki derbarê pîrîya xo de zî yew şîîre nuştê û na şîîra xo de gencîye û ciwanîye sey xezîne vînenê û îqlîmê pîrîye sey cayêko xirab teswîr keno. Wina vano:

Elweda ey text û tacê gulnîşîne in welat
Elweda ey warê Mergmîr sêr çîmê owkê heyat

Xuertônî ra mi weda kerd kota îqlîm pîrîtî
Mî wisar ‘umîr xu nazîk kerd bin herrê xurbetî

Ez kota payîz ‘umîr xu d’kota adîr fîrqaî
Pêl doran ser bî zerd yê n war kuên sêr çomîr mîrîtî

Ez muheqqeq pîrîtî xu z’ kena mezêl fîrqaî
Yo heyat şî n hona ben vîn hetta sewê rehmetî

Merheba ey tunêl ‘uqba merheba ey mezarîstan
Merheba ey berzêx dunya merheba ey bêr gulîston (Beki, 2015: 270).

Beki beytanê corênan de pîrîtîye, mezel, mergî, şîyayîşê emrî, mezarîstan, gulîstan û gelek metaforan tê reyde şuxulneno. Beki beyta dîyîne de vano ke êdî o demê xortanîya xo ra derbas bîyo û çaxê pîrîtîye de yo. O serdemê pîrîtîye sey payîzê emrî pênas keno. Mezel seba Beki sey berê fîrqaî yo. Beyta hîrêyîne de Bekî îdîa keno ke mezel û merg beyntarê însanî û heskerdixan de yew *fîrqaî mecazî*

virazeno. Kes qey vano ke Beki halê pîrîtîya ra nerehet o labelê o mezaristanî sey derbasê cennetî yanî gulistanî berêk vînenê. *Fîrquetê adirînî* reyêk de wusletê gulistanî ya bedilneno. Beki heme proses û astanê heyatî bîyayîş ra heta mergî rêz keno. Merg seba Beki rewşêka xirabe nîya, o mergî sey berê gulistanî vînenê. Ciwanîye û xortîye ra dûrîkewtiş, pîrîtîye seba heyatê însanî *fîraqo heqîqî* yo, xora Beki zî ney sey fîraqî îfade keno. Ney de guman çînî yo. Beki mergî û mezelî zî sey fîraq îfade keno labelê reyêk ra fîraqo mecazî cayê xo terke wusletê heqîqî keno; mezel, merg beno resayîşê gulistan û wetenê eslî.

Mela Faruq Baynal edebîyatê Zazakî de yew şaîrêko newe yo. Baynal serra 1972î de Çewlîg de ameyo dunya. Baynal xêncê şîran berhemane dînî zî nuseno. Berhemê ey *Diwanê Arçugi* serra 2021î de ameyo çapkerdene. Baynalî perwerdeyê medrese tehsîl kerdo, îcazet ra dîma sey mela wezîfe kerdo. Heta nika hîrê kitabê ey çap bîyê. Derheqê merg û fîraqî de Baynal wina vano.

Merg bîb' dunya d' mîrad çin o
Zafin tedî kerd kê dunya
Kê xu bar kê tu r' çik çin o
Tî bar kê şin yonê dunya

Kuên tu kışt xapnên 'ezazil
Tî von 'umîr derg niqedyên
Tî ina dunya d' kê zêlil
Bên hişar 'umîr şin qêdyen (Baynal, 2021: 102).

Baynal, dunyayî sey cayêko derbasdar vînenê û vano ke dunya kesî rê nêmeno û kesî rê nêmaneno. Şeytan însanan bi dergbîyayîşê emrî ya xapêneno, însanan dunya de zelîl keno yan însanî xo bi xo rezil kenê; gama ke însanî hişyar benê emir qedîyêno. Baynal derheqê mergî de sey kewanê towbekaran fikirîyêno. O qayîl nîyo ke heyat biqedîyo û însan bimîro. Towbekarî her tim wazenê ke towbedarîya xo rê emîn bibê, heyatê dunyayî de karanê başan bikerê û seba heyatê axîretî emelanê xo ra bawer bibê. Baynal zî beytanê corênan de nêzdîyê nê fikirî çîyan vano. Merg qandê wusletê heqîqî û mutleqî yew ber o, heyatê dunyayî ganî baş bêro nirxnayene.

Peynîya peyên de
Tî do bîresî menzîlo tewr peyên
Berî qebr bikuwî
Bigerîyayî zere
Tî do bêrê şelênayîş
Tena kincan ra ney,
Heme rutbeyan ra...
Zit bulit bimanî.
Tî lajî kam î?
Kam êilet ra, kam qewm ra yî?
Çi ziwan qalî kenî? (Merdîmîn, 2015: 65).

Merdimîn mergî qedîyayîşê heme çîyan, heme xusletan, heme rutbeyan ûsn teswîr keno. Merg nê dunyayî de menzîlo peyên o, semede axîret zî menzîlo ewilên o. Însan mergî reyde heme taybetmendîyanê xo ra yeno şelênayene. Kamîya merdî çînî ya, emelê merdî estê. Merg, fîraqêko heqîqî yo, çunke însanî nê dîyardeyî reyde dunyayî terk kenê, dunyayî ra dûrî kewenê.

Labelê bol neşîbi, nêweşîya Resûlî,
Gam bi gam vêşî bîyê, bol tewnayê ê qûlî.

Veynda Hezretî Zehra, qîsey kerd bi usûlî.
Va mi rê aseyno, elametê ufûlî.

Roja duwêsê mengî di, û wextê vera şanî.
Serwerê hurna dinî, ê hebîbê Rehmanî.

Melek-ul Mewtî dest di, terikna nê mekanî.
Resa Refîqê Ala, veradabî ê ganî.

Usame zî ageyra, arêbîyay musulmanî.
Veşayê zerrya înan, bi feryad û fixanî.

Fatima helisyayê, bindê huzn û kederî.
Boy kerd sawit rîyê xu, mezel ra taye herî.

Boll nêşîbi ney ser o, xu resna Pêxemberî.
Herunda ay di mendin, di teney yadîgarî (Babîj, 2009: 101-103).

Osman Esad Efendîyo Babîj mergê peyxemberî bi şekilêko trajîk û dramatîk teswîr keno. Peyxember seba *fîraqê mecazî* xo amade keno, keynaya xo reyde qalî keno, aye ra xatir wazeno. Melekê mergî yanî Ezraîl yeno hetê ey, peyxember *wusletê heqîqî* pê ano û reseno *Refîqê Ala* yanî dostê tewr berzî (Uludağ, 2016: 293). *Fîraqo mecazî* heman dem de vurîyêno û înkîlabê *wusletê heqîqî* beno. Osman Esad Efendî halê eshaban zî teswîr keno. Embazê peyxemberî badê wefatê ey senînîya mergê peyxemberî hîna îdrak nêkerdo, eshabeyî zaf feryad û fixan kenê. Keynaya peyxemberî huzun û kederî de xerîqîyêna.

Huseyn bi sukey Medîna d', Huseyn ame dunya uca d'
Huseyn kişîya Kerbela d', dunya ra şî Hezret Huseyn.

Huseyn kişîya bi şehîd, sarey yî şî resa Yezîd,
Yezîd şeçî, Huseyn se'îd; dunya ra şî Hezret Huseyn (Hûnî, 2004: 78-79).

Hûnî firqet û mergî rê yewna pencera ra nîyadano. Hedîseya Kerbelayî tarîxê Îslamî de yew facîyaêko gird o. Meseleyanê sîyasîyan ra badê peyxemberî

muslumanî kewtê pê, beyntarê muslumanan de rîdê hukumdarîye ra waqiyayê girdî ameyê meydan. Torinê peyxemberî Huseyîn û lajê Muawîyeyî Yezîd seba xelîfîtiye herb kerdo û peynî de Yezîdî hezretê Huseyîn qetil kerdo. Yezîdî sereyê Huseyînî cikerdo û o no qayde tehqîr kerdo (Köksal, 1979). Hûnî zî na meseleya trajîke, mergê Huseyînî metaforanê merg, şîyayîş, şehîdbîyayîşî ya îzah keno. Huseyîn seîd o, keyfweş o, bextewar; Yezîd şeqlî yo, bêbext o, vîndikerde yo. Lê Huseyîn şîyo yanî merdo, Yezîd mendo. Huseyîn bi neheqî reyde şîyayîş û resayîşê heqî cû wusletêko heqîqî pê ardo. Yezîdî zî neheqî kerda qandê cû heqî ra bitemamî fîrquet kerdo.

Ganî ra merde, merde ra ra ganî...
Huner o yo ke ti bizanî
Beşkî biwanî (Merdimîn, 2015b: 19).

Merdimîn mergî û cuye keno tēmîyan û wina şirove keno: merde ra ganî, ganî ra merde. Eslê xo de Merdimîn nê formî ayetan ra îqtîbas keno. Qur'an de Homa vano ke 'O merdî ra ganî, ganî ra merdî vejeno' (Sûreya Rûm, 19). Merg û cuye kamcîn a, sînore nê her di dîyardeyan kotî de dest pêkeno û kotî de qedîyêno dîyar nîyo. Ancax zana sînoranê nê dîyardeyan eşkeno bizano. Merg eke sey fîraqî bêro qebûlkerdene, o wext cuye zî bena wuslet. Nê her di termî tēmîyankewte yê. Wuslet kotî de dest pêkeno û fîraq kotî de qedîyêno dîyar nîyo. Goreyê kontekstî wuslet û fîraq eşkenê ca bivurînê, cayê yewbînan de bêre şuxulnayene. Keso ke eşkeno rewşe biwano, kamcîn merg o kamcîn cuye ya, kamcîn wuslet o kamcîn fîraq o fehmi keno.

Encam

Wuslet û fîraq di heb dîyardeyê tēmîyankewte yê. Nê her di mefhûmî mîyanê heyatî de ca gêne û edebîyat zî nê mefhûman zaf zêde şuxulneno. Edebîyatê dunyayî de nê di mijarî zaf ameyê bikarardene labelê edebîyatê rojhelatî de wuslet û fîraq -tesîrê dînî ra zî- hîna zêde ameyo şuxulnayene.

Wuslet û fîraq eşqî ya girêdayeyê. Eşqî ra qesd tenya tēkilîya cinsî ya ke beyntarê cinî û camêrdî de peyda bena nîya. Memleket, gede, mal, mulk, weten, embaz ûsn zî eşkenê mîyanê eşqî de binirxîyê. Eşq senîn ke sey heqîqî û mecazî eşkeno tesnîf bibo, wuslet û fîraq zî hetanê mecazî û heqîqî ra eşkenê bêre analîzkerdene. Eşqo heqîqî, eşqê mutealî îfade keno û amancê nîhaî yê eşqî xora no yo. Wuslet û fîraq de zî amanc resayîşê heqîqetî yo.

Wuslet û fîraq cîya şekilan de eşkenê bêre şirovekerdene. Rewşa ke şiroveker tede de yo mahîyetê wuslet û fîraqî tesbît keno. Wuslet eşkeno fîraq, fîraq eşkeno wuslet bibo. Wuslet û fîraq mîyanê cuya însanî de di rewşe normal ê. Heta fîraq çiqas derg bibo, wuslet hende şîrîn beno. Tehm û hêzê wusletî, qewet û mudetê fîraqî ya eleqedar o. Edebîyat bi mubelexe nê rewşan tarîf keno. Edebîyato klasîko ke bin tesîrê fikiranê dînî de yo, derheqê peyxemberî de rewşa fîraqî zaf mubelexe nuseno. Qur'an de terefê însanbîyayîşê cenabê peyxemberî her tim derb beno. Demê peyxemberî de zî, qaso ke tarîx nuseno, mergê

peyxemberî zaf qehrê sehabeyan ardo labelê înan no merg qebûl kerdo. Edebîyat nê hestan zêde mubelexe îfade keno.

Edebîyatê Klasîk yê Zazakî bin tesîrê tradîsyonê edebîyat û felsefeyê rojhelatî de yo. Felsefeyê rojhelatî û terefê ey yo şênber tesewuf de, dunya cayê surgunî yo. Însan dunyayî ra ganî razî nêbo. Wetenê eslî yê însanî axîret o. Nê fikirî Edebîyatê Klasîk yê Zazakî de zî xo ramojnênê. Labelê no tesewufêko sert û qetî nîyo. Nuşttoxê Edebîyatê Klasîk yê Zazakî dunya ra gazincênê, heman dem de ey ra îstîfade kenê û heyatê dunyayî sey berê axîretî xeyal kenê.

Welidîyayîşê peyxemberî seba bawermendan mizgîn a. Însanî, heywanî, ganî û bêganî heme ameyîşê peyxemberî reyde şad ê. Seke cor ra zî îfade bî, no fikir tradîsyonê edebîyatê rojhelatî de derbas beno. Mersîmanê mewlîdan de no rîtuêl bi şekilêko pergalkî roneyayo.

Hîcret zî formêkê fîraqî yo. Hîcret yan koçkerdiş xo de resayîş û apey ageyrayîşî zî hewêneno. Edebîyatê Klasîk yê Zazakî de zafane hîcretî bedenî û hîcretî lefzî bikar ameyo. Berhemê ke ameyê etudkerdiş de hîcretê peyxemberî sey hîcretî bedenî qebûl bîyo. Hûnî hedîseya hezretê Yûsufî de hîcretê bedenî û lefzî ser o vinderîyêno. Hende serranê dergan de Yûsuf qelben welat û babîyê xo ra dûrî nêkewto. Xêncê Hûnî zî kesî hîcret no mînwal de nênuşt. Seba hîcretkerdişî nuqtaya bingeyine hetê psîkolojî ra amadebîyayîş o, hîcretê peyxemberî de na nuqta zaf ameya îşaretkerdene.

Berhemê Edebîyatê Klasîk yê Zazakî ke na xebate de ameyê nîrxnayîş de dunya cayê surgunî yo. Eslê xo de no ewnîyayîş bi şekilêko pêroyî heme edebîyatê klasîk yê rojhelatî de xo nîşan dano. Merg sey metaforêko baş/rind ameyo îfadekerdene. Merg beyntarê dunya û axîretî de berêk o. Edîbî mergê siruştî ra zêdêrî mergo îxtîyarî ser o vinderîyayê. Bawermend yan salik verê mergî ganî xo mehkeme bikero, gunah û qebhehan xo ra towbe bikero. No fikirêko tesewufî yo. Mîyanê Edebîyatê Klasîk yê Zazakî de tesewufo mutedîl hakîm o. Merg, dunya û axîret mutedîl şîrove bîyê.

Edebîyatê Klasîk yê Zazakî bin tesîrê edebîyatê rojhelatî de yo. Taye cayan de nê edebîyatî ra abirîyêno. Heme erkê edebîyatê rojhelatî edebîyatê Zazakî de çinî yê. Heman dem de Edebîyatê Klasîk yê Zazakî de wuslet, fîraq, welidîyayîş, merg, dunya, hîcret, dûrîkewtiş, resayîş ûsn mefhûmî bi şekilêko mutedîl nusîyayê. Taye nuştoxan de mubelexe yeno tesbîtkerdene labelê zafane nê mefhûmî mîyanê heyatê însanî de sey rewşê normalî îfade bîyê.

Çimeyi

- Akalın, Ş. H. ve diğerleri. (2011). *Türkçe sözlük*. Ankara: Türk Dil Kurumu Yayınları.
- Alay, O. (2011). Yusuf ve Züleyha hikâyesinin epizot tahlili ve motif yapısı. *Folklor/Edebiyat*, 17(68), 2011/4.
- Apuhan, D. (2022). *Molla Mehmet Demirbaş Divanı*. Bingöl: Vir Yayınları.
- Babij, M. C. (2009). *Sîyerê Nebî bi ziwanê Dimilî*. İstanbul: Nûbihar.
- Baynal, M. F. (2021). *Diwanê Arçugî*. Bingöl: Neşirxaneyê Vir.
- Bekî, M. A. (2015). *Diwon Cebexçuri*. Bingöl: Bingöl Üniversitesi Yayınları.
- Ce'ferî, F. (1394). *Feraîd ferhengî wajekanî duşwar û newadîrî Qur'anî Kerîm ber payeyî tercumehayî kuhen*. Tahran: Pejûheşgahî Ulûmî İnsanî û Mutelaatî Ferhengî.
- Ceyhan, S. (2013). *Vüsûl*. TDV İslam Ansiklopedisi. İstanbul: TDV Yayınları.
- Cürcanî, S. Ş. (1997). *Arapça-Türkçe terimler sözlüğü "Kitabu't-Tarifât"*. İstanbul: Bahar Yayınları.
- el-Fîruzabadî, M.-d. M. (2011). *Mu'cemu'l-Qamusu'l-Muhîf*. Beyrut: Daru'l-Me'rîfe.
- el-Xezalî, H.-Î. E.-T. (2005). *Îhyau ulûmud'dîn*. Beyrut: Darû İbnî Hezm.
- Erkan, A. (1999). *El-Beyan Arapça-Türkçe büyük sözlük*. İstanbul: Yasin.
- Farqînî, Z. (2022). *Ferhenga Kurdî-Tirkî*. İstanbul: Enstitüya Kurdî ya Stenbolê.
- Geverî, A. (2013). *Yûsuf û Zuleyxa Selîmîyê Hîzanî*. İstanbul: Nûbihar.
- Grûba Xebate ya Vateyî. (2019). *Sözlük Türkçe-Kirmancca (Zazaca), Ferhengê Tirkî-Kirmanckî*. İstanbul: Vate.
- Gürkan, S. L. (2007). *Ölüm*. TDV İslam Ansiklopedisi. İstanbul: TDV Yayınları.
- Hûnî, M. M. (2004). *Kirdkî (Zazakî) Mewlîd Yûsûf û Zelîxa & Qesîdeyê Kerbela*. İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî.
- İşler, E. ve Öztürk, İ. (2012). *Türkçe-Arapça kapsamlı sözlük*. Ankara: Fecr Yayınları.
- Kanar, M. (2010). *Farsça-Türkçe sözlük*. İstanbul: Say Yayınları.
- Kanar, M. (2012). *Türkçe-Farsça sözlük*. İstanbul: Say Yayınları.
- Kırcan, A. (2018). *Bîyişa Pêxemberî ya Osman Esad Efendî û destpêkê edebîyatê klasîk yê Kirmanckî*. İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî.
- Köksal, M. A. (1979). *İslam tarihi: Hz. Hüseyin ve Kerbela faciası*. Ankara: Akçağ Basın Yayın.
- Merdimîn, W. (2015). *Dîwano Nêmcet*. İstanbul: Weşanxaneyê Peywend.
- Merdimîn, W. K. (2015). *Dîwan*. İstanbul: Weşanxaneyê Peywend.
- Muşeki, M. E. (2020). *Mewlîdê Nebî*. Bingöl: Neşirxaneyê Vir.
- Mutçalı, S. (2012). *Türkçe-Arapça sözlük*. İstanbul: Dağarcık.
- Mutçalı, S. (2013). *Arapça-Türkçe sözlük*. İstanbul: Dağarcık.
- Önkâl, A. (1998). *Hicret*. TDV İslam Ansiklopedisi. İstanbul: TDV Yayınları.
- Özel, A. (1998). *Hicret*. TDV İslam Ansiklopedisi. İstanbul: TDV Yayınları.
- Pala, İ. (2014). *Ansiklopedik divan şiiri sözlüğü*. İstanbul: Kapı Yayınları.
- Puexî, M. K. (2020). *Diwan*. Bingöl: Neşirxaneyê Vir.
- Sekaronij, M. O. (2023a). *Diwan*. Bingöl: Neşirxaneyê Vir.
- Sekaronij, M. O. (2023b). *Siyerê Nebî*. Bingöl: Neşirxaneyê Vir.
- Şenateş, Ş. (2022). *Ferhengê Zazakî*. İstanbul: Nûbihar.
- Uludağ, S. (2007). *Ölüm*. TDV İslam Ansiklopedisi. İstanbul: TDV Yayınları.

- Uludağ, S. (2010). Sülûk. TDV İslam Ansiklopedisi. İstanbul: TDV Yayınları.
- Uludağ, S. (2016). *Tasavvuf terimleri sözlüğü*. İstanbul: Kabalcı Yayıncılık.
- Varol, M. (2020). *Diwanê Pueğî*. Ankara: Sonçağ Akademi.
- Varol, M. (2023). *Risaleyê Kavari Mela Muhammedê Kavari*. Bingöl: Neşirxaneyê Vir.
- Xasî, M. E. (2013). *Mewlîdê Kirdî*. Diyarbakır: Weşanxaneyê Roşna.
- Yavuz, S. S. (2020). Mi'rac. TDV İslam Ansiklopedisi. İstanbul: TDV Yayınları.
- Yıldırım, N. (2008). *Fars mitoloji sözlüğü*. İstanbul: Kabalcı Yayınevi.
- Yıldırım, N. (2016). *İran kültürü: Zerdüş'ten Firdevsî'ye, Sadi'den Şamlu'ya İran'ın sözlü ve yazılı kaynakları*. İstanbul: Pinhan Yayıncılık.
- Yıldız, P. (2024). Şîra moderne ya Kırmanckî (Zazakî) de vuslat û fîraq. *Mukaddime (Vuslat ve Firak Özel Sayısı)*, 162-180.